# ÇANDNAME

E-KOVARA ÇANDA KURDÎ YA MALPERA WWW.CANDNAME.COMÊ • JIMAR 4 • 01/2021 •

## LI PEY ŞOPA BAV Û KALAN BI RENG Û DENGÊN JÎYANÊ




DI EDEBIYATA KURDÎ DE RÊZEROMANÎ
CÎHAN ROJ [04]

DIRÛNKAR
PAŞA AMEDÎ [23]

BI ÇAVEKÎ ZANISTÎ GERDÛN Û EM
XALID CELALÎ [16]

ENDÎŞE (METIRSÎ)
CÜNEYT YAZICI [20]

# BI SILAVÊN GERM

## JI EDÎTORYAYÊ


**ÇANDNAME**
e-kovara çanda kurdî
ya malpera www.candname.comê
jimar 4 • 01/201

Xwedî û Berpirs
**Firat Bawerî**

Edîtorya
**Paşa Amedî**
**Ridwan Xelîl**

Bergsazî û Rûpelsazî
**GrafiKURD**

Wêneyê Bergê
**Murat Adiyaman**

Navnîşan
/www.candname.com
/candname1@gmail.com
/candnamekovar@gmail.com
/candnamemalper
/candnameCom
/candnameTV

Nivîskar ji nivîsên xwe,
Xwendevan ji xwendina xwe berpirs in.
Lijneya kovarê li ser nivîsan dikare
serrastkirin û guherînan bike.
Her nivîsa ku hatiye şandin
dibê ku newê weşandin.


*Xwendevanên Hêja û Birûmet;*

Kovara Çandnameyê bi jimara xwe ya çarem derket. Li kovargeriya kurdî pîroz be. Dîse kovara me bi mijarên curbicur û rengînbûna xwe bûye keşkuleke kelepora medern û ya klasîk. Bo hemû nivîskarên xwe re sipasîyên xwe dişînin. Di nav bazarek wilo kesat de bi dildarî piştgiriyê didin kovara me. Dîse em sipasîyên xwe bo hemû şopînerên xwe re dişînin ku di vê bazarê de berhemên me biqîmet dikin.

Şopînerên delal em di heyamake zor û zehmet re derbas dibin, me got bazara me kesat e. Ji aliyek din rewşa me kurdan di nav miletên dinyayê de ji aliyê rêvebirîyê pir xerab e. Nexweşiya koronayê jî li cem nexweşiyên me yên derûnnasîyê ket nav meselê û kar û barên kurdî ketin bin zehmetê. Lê kurdên me yên bi xîret di demek kurt de adapteyî heyama nû bûn xebatên xwe demek kurt de derbasî qada sehî an go dîjîtalê kirin û niha ji berê behtir çalakiyan dikin. Helbet di her zahmetiyê de rêyeke rahmetê jî heye. Em hevî dikin bi vê guherîna nû pîştî heyama koronayê kurdên me bi xîretên xwe bidin pêşîya gelek miletên din.

Amadekirina kovarekê pir zehmet e. Rêvebirin ji aliyekî, avakirini ji aliyekî wek du baskan divê bi hev re bixebitin da ku berhemek xweşik derkevê holê. û kovargerî ne karê kesekî ye karekî komekê û kedeke kollektîf e. Ji destpêka Kovara Çandnameyê heta îro me pir zehmetî kişandin hin caran demên duvdirêj navber da kovarê lê dîsa jî me dev jêberneda ji ber ku em vî karî wek deynekî neteweyî dibînin, ji ber kar û barên me yên bi zehmet alîkariya me bi nivsên nû yên bi xîret heye. Bo xebatên xwe û kovara xwe bi pêş de bibin ji vir em bangî hevalên bi xîret dikin ku werin bi dildarî tevlî vê xebata pîroz bibin.

Di vê jimarê da van hevalan bi nivîsên xwe piştgirî dan me:

**Lokman Polat** bi nivîsa **Di Edebiyata Kurdî De Rêzeroman** • **Ömer Dilsoz** bi nivîsa **Derdê Colemêrgiyan Di Alema Kurdîyê De** • **Sermedar Siriûs** bi nivîsa **Gêjevang, Navbirka Reş Û Spî; Hişê Milletekî** • **Xalid Celalî** bi nivîsa **Bi Çavekî Zanistî Gergûn Û E** • **Cüneyt Yazici** bi wergera **Endîşe (Metirsî)** • **Paşa Amedî** bi amadekirina nivîsa **Dirûnkar** • **Cüneyt Yazici** bi vergera **Ji Bo Rûyekî Birqok Em Çi Bikin?** • **Axa Kurdikî** bi helbesta **KURMANCÎ** • **Mihemed Hesko** bi helbesta **Pêşberî** • **Mela Mihyedîn** bi nivîsa **Diljen Ronî re** hevpeyvîna bi navê **Bijişkekî Jêhatî Û Dengxweş** • **Konê Reş** bi nivîsa **Mîrzade Sînemxan** • **Zîndîwerzan Zelal Kurdî** bi nivîsa **Ji Bo Zarokan Feydeyên Vexwarina Şîr** • **Faysal Dağli** bi nivîsa **Efrîn; Dîrok Û Erdnîgariya Zêrîn** • **Dîyadîn Akdemîr** bi nivîsa **Ji We Dikim Îstîrham Bixwînin Hûn Bi Temam**• **Zîwer Îlhan** bi nivîsa **Ferhengoka Çanda Rezberî û Miştexê** • **Fzt. Mustafa Önal** bi nivîsa **Piştî Vegirtina Koronavîrusê Rewşa Tenduristîya Laş** tevlî kovara me bûne.

*Edîtoryaya Çandnameyê*



# NAVEROK


**Di Edebiyata Kurdî De Rêzeroman**
Lokman Polat ........ 04

**Derdê Colemêrgiyan Di Alema Kurdîyê De**
Ömer Dilsoz ........ 07

**Gêjevang, Navbirka Reş û Spî; Hişê Milletekî**
Sermedar Siriûs ........ 12

**Bi Çavekî Zanistî Gerdûn û Em**
Xalid Celalî ........ 16

**Endîşe (Metirsî)**
Werger: Cüneyt Yazici ........ 20

**Dirûnkar**
Amadekar: Paşa Amedî ........ 22

**Ji Bo Rûyekî Birqok Em Çi Bikin?**
Werger: Cüneyt Yazici ........ 25

**Helbestên Dilan**
**Kurmancî** - Axa Kurdikî ........ 26
**Pêşberî** - Mihemed Hesko ........ 26

**Bijişkekî Jêhatî û Dengxweş: Diljen Ronî**
Hevpeyvîn: Mela Mihyedîn ........ 27

**Mîrzade Sînemxan**
Konê Reş ........ 34

**Ji Bo Zarokan Feydeyên Vexwarina Şîr**
Zîndîwerzan Zelal Kurdî ........ 36

**Efrîn; Dîrok û Erdnîgariya Zêrîn**
Faysal Dağli ........ 38

**Ji We Dikim Îstîrham Bixwînin Hûn Bi Temam**
Dîyadîn Akdemîr ........ 45

**Ferhengoka Çanda Rezberî Û Miştexê**
Zîwer Îlhan ........ 49

**Piştî Vegirtina Koronavîrusê Rewşa Tenduristîya Laş**
Fzt. Mustafa Önal ........ 57

# DI EDEBIYATA KURDÎ DE RÊZEROMAN

**LOKMAN POLAT**

> *Çend nivîskarên kurd rêzeromanên kurdî nivîsîne û bi nivîsîna rêzeromanên xwe edebiyata kurdî û herweha romana kurdî pêş xistine, dewlemend kirine.*

Li bakurê Kurdistanê edebiyata kurdî a nûjen hêj nû ye. Lewre jî hinek şêweyên berhemên edebî yên modern hêj nû di nav edebiyata kurdî de cihên xwe girtine. Kurteçîrokên modern ku ji alî nivîskarên kurd yên niha ve têne nivîsîn û çîrokên gelêrî yên berê newekhev in. Çîrokên ku di edebiyata devkî a kurdî de hene û çîrokên ku niha bi şêweyeke nûjen/modern û postmodern têne nivîsîn bi her awayî ji hevûdu cuda ne.


Roman, kurteroman û novelên nûjen yên ku niha ji alî nivîskarên kurd ve hatine afirandin nû ne. Di edebiyata klasîk û ya devkî de tiştên weha tunin. Di edebiyata kurdî a modern de afirandina rêzeromanên kurdî ji afirandina roman û novelên kurdî jî nûhtir e. Rozeromanên kurdî di van salên dawîn de di nav edebiyata kurdî de cihê xwe girt. Nivîskarên kurd yên ku rêzeroman nivîsîne neewqas pir in. Çend nivîskarên kurd rêzeromanên kurdî nivîsîne û bi nivîsîna rêzeromanên xwe edebiyata kurdî û herweha romana kurdî pêş xistine, dewlemend kirine.

Di nav edebiyata kurdî ya rojhilatê Kurdistanê de rêzeromanên kurdî hene yan na ez nizanim. Bi qasê ku ez zanim di vê beşa Kurdistanê de romana kurdî pêş neketiye, dewlemend nebûye, qels maye.

Li bin xetê – başûrê biçûk ê rojavayê Kurdistanê – hinek nivîskarên kurd çend romanên kurdî nivîsîne, lê di nav wan berhemên edebî de rêzeroman tunin. (Heger hene haya min jê tune.) Li başûrê Kurdistanê bi qasê ku ez zanim nivîskarê kurd ê başûr Nusret Caf rêzeromaneke ku ji heşt cildan pêk hatiye nivîsiye û weşandiye. Dibe ku hinek nivîskarên din yên başûr jî rêzeroman binivîsin, lê haya min jê tune.

(Romanên hinek romannivîserên kurd ên başur bi kurmancî li bakurê Kurdistanê hatin weşandin. Herweke romanên Bextiyar Elî, Mardîn Îbrahîm, Ferhad Pîrbal û yd. Lêbelê romanên Nusret Caf hêj bi kurmancî nehatiye weşandin.)

Di edebiyata kurdî de herî pir rêzeroman ji alî kurdê bakurê Kurdistanê ve hatine nivîsîn. Nivîskarên kurd yên ku li bakurê Kurdistanê rêzeromanên kurdî nivîsîne ev in : 1 – Mehmed Uzun, 2 – Laleş Qaso, 3 – Lokman Polat, 4 – Mazhar Bozan, 5 – Yaqob Tîlermenî, 6 – Hesen Huseyin Deniz, 7 – Diyar Botî, 8 – Dîlawer Zeraq, 9 – Mihemed Dehsiwar û hwd, ên ku navên wan nehatin bîra min û min navên wan li jor nenivîsî, bila li min biborin.



Li gor agahdariya ku min wergirt, dibêjin di nav nivîskarên kurd yên Kafkasyayê – Sowyeta berê – de hinek nivîskarên kurd rêzeroman nivîsîne. Navê nivîskarê kurd Egîdê Çerkez û Ereb Şemo tê gotin. Min bi xwe heta niha tu berhemeke Egîdê Çerkez nexwendiye. Rêzeromanên wî henin yan tunin, ez nizanim. Hinek berhemên Ereb Şemo weke rêzeroman dihesibînin, bi min berhemên wî weha nin in. Heta hinek ji berhemên wî romanin yan neromanin, tê minaqeşe kirin, bi min jî, ew jî mijara minaqeşeyê ne.

(Rêzeroman romanên ku ji du, sê, çar heta heşt, deh pirtûkan pêk tên, yanî weka çend cîldan in û berdewama hevûdune re tê gotin. Bi tirkî ji rêzeromanê re “nehîr roman” dibêjin. Yanî romana çemî. Anku ev şêwe roman weke çem herikbar e, bi hevûdu ve girêdayiye, berdewama hevûdu ye. Rêzeromana Mehmed Uzun “Hawara Dijle” ji du cîldan pêk tê. Rêzeromana Laleş Qaso ji sê cîldan pêk tê. Rêzeromana min-Lokman Polat- ji çar cîldan pêk tê. Ya Mezher Bozan ji pênc cîldan pêk tê. Rêzeromanên Yaqob Tîlermenî , Hesen Huseyin Deniz û Diyar Botî her yek ji du cîldan pêk tên.

Divê lêkolînvanên edebiyatzan yên kurd li ser şêweya nivîsîn û naveroka rêzeromanên kurdî lêkolîn bikin, rexnegirên edebî bi şêweyeke edebî rêzeromanên kurdî analîz bikin û xwendevanên kurd jî rêzeromanên kurdî bixwînin.



# DERDÊ COLEMÊRGIYAN DI ALEMA KURDÎYÊ DE

**OMER DILSOZ**

> *Axir.. dirêj nakim. Colemêrg di vê alema kurdîniyê de wekî giravekî asê û dûreçav maye. Mixabin.. sed mixabin hiş û hişmendiya vê keleha qedîm a welatê me, her diçe berkendal dibe û kurdînî lê dimire..*

Ez dixwazim vê carê li ser derdê Colemêrgiyan hin tiştan bidim ber pirs û lecê. Colemêrg, warekî asê, xwedan dîrokek mêjîn û kevnar e, nakevim nav van meseleyan. Pirsa me di kurmanciya Bakur de cihê Colemêrgiyan e..

Devoka Colemêrgî pê diaxivin, di kurmanciyê de devokeke veder û xweser e. Her çend bi axaftinê Colemêrgî di navbera Botan, Serhed û Badînan de li cihekî disekine jî, di rastiya xwe de ji gelek aliyan ve ev devok xweserî xwe ye. Bo nimûne tîpa “r” tenê li vê derê nermijîye. Gelek formên taybet ku hema bêje di kurmanciya me ya Bakur û nivîskî de nemane, li vê derê li dar in...

Devoka Hekarya piranî bi şêweyê axaftinê dişibe Badîniyê.. lê di warê gramer û rênivîsê de, gelek cudahî di navbera Badînî û Colemêrgiyê de heye.

Her weha di sentaksê de Colemêrgî perrekî wê dişibe Botaniyê, perrek jî dişibe Serhediyê, lê bi awayekî giştî ji herdu devokan jî gelekî cihêtir û xwedan formên taybet e.

Ji ber vê yekê jî Colemêrgî di kurmanciya nû ya nivîskî de para mane û zû bi zû xwe nadin berê. Çimkî ne dikarin xwe qenc tê de îfade bikin ne jî dikarin baş lê serwext bibin.

Encamên vê gelekî berçav in. Bo nimûne: tu niha ji ciwanekî Colemêrgî bipirsî bê ka bo wî sembola edebiyata kurdî û rewşenbîriya kurdî kî û kî ne.. dê bo te navê Muhsin Kizilkaya û Yilmaz Erdogan bidin.


Ciwanek Colemêrgî exlebî gava dest bi nivîsînê dike, wek stêrk û nimûne, van kesan ber çavên xwe dibîne.

Mesela: Li gundek Qeyseriyê pirtûkên min peyda dibin, li Colemêrgê tune. Çima? Çimkî hayê wan ji alema kurdî nîn e. Naxwînin. Ne ku naxwazin.

Nikarin bixwînin. Tênagihêjin. Ji wan re ecêb têt. Ev trajedyayeka ecêb giran e, lê rastiya me ye.

Helbet pêwist e zimanekî nivîskî yê kurdî hebe.. lê ligel vê divê em Colemêrgiyan jî fam bikin. Axaftin Badînî, sentaks Botanî.. di navbera nal û bizmarê de..





Ez her roj ji ber Colemêrgî me, xasma di kitêbên xwe de ji sedî 20 zarê Colemêrgî nanivîsim jî, ez hemû kurdîyê didim ber xwe dîsan jî gava kitêbên min dixwînin, ferhengan dinêrin. Îja bifikirin: gava mirov bi kotekiya ferhengan kitêbek xwend dê çi tahmê jê wergire? Dê çendê bi rastî jê fêm bike? Îja bi ser de îroniyên nivîskar, teqlelêdanên bi zimanî, gêreya hizr û bîran


Tev bê berginde û hilawîstî dimînin. Yanî ji kîsê nivîskar diçin. Qet nayê famkirin....

Colemêrg ne tenê di warê sentaks û musîqeya zimên ve ji Bakur cuda ye, her weha "daçek" ji serî heta binî cuda ne.. bo nimûne: Jêk.. pêk.. lêk.. gel êk.. û hwd. di kurmanciyê de tenê li Colemêrgê hene...

Axir.. dirêj nakim. Colemêrg di vê alema kurdîniyê de wekî giravekî asê û dûreçav maye. Mixabin.. sed mixabin hiş û hişmendiya vê keleha qedîm a welatê me, her diçe berkendal dibe û kurdînî lê dimire..

Nivîskara kurd Sîma Semend (1933-2008) ku fîlolojî qedandiye (1958) bi kurtçîrokên xwe hatiye nasîn. Hin pirtûkên wê ev in: "Xezal" (1961), "Du Şahî" (1967). Çend berhemên wê di Rêya Teze da jî hatine weşandin. Bi pisporê têkiliyên kurd û ermeniyan Karlanê Çaçan ra mêr kiribû.

**(Rohat Alakom)**



Сима Сəмəнд

Əwлəда щмаə'та к'ӧрда Сима Сəмəнд, хwəйа хwəндьна бльндə, хəбатчийа р'едаксиа р'адиоейə хəбəрданед к'ӧрдийə. Пəй хəбатер'а, гава həр йəк hеса дьбə, Симе бəр истола хwəйə хəбате р'удьне, дьнвисə... дəрhəqа ə'мре к'ӧлфəта к'ӧрдə бəхтəwарда дьнвисə. Щаhьлə, ле к'т'еба wейə ə'wльн иди сəр истола хwəндəвананə. Бəле, гəлəк тыштед нвисаре həнə, ə'мре к'ӧлфəта к'ӧрдə бəхтəwар нвиск'ара щаhьл мəщбур дькə, wəки qəлəме hьлдə дəсте хwə у бьнвисə. У əw дьнвисə. Зутьрəке wе к'т'еба ə'франдьнед хwəйə майин к'ӧта бькə, т'ема к'ижане диса ə'мре мəрьвед советиейə, пьзмамтийа щмаə'танə, диса дəрhəqа бəхтəwарийа к'ӧлфəта к'ӧрдаданə.

Zeyneba Îvo di sala 1931ê de bi radyoya Yerîwanê deng û besê nû ji rojnameya Riya Teze dixwîne.



Gerokê swêdî yê navdar Sven Hedin berî sed salî li ser Kurdistana Bakûr ra heta Hîndîstanê gereke dirêj pêk aniye. Di gernameya xwe da wêneyên hin mirov û bajarên kurdan jî weşandiye. Yek ji wan Bazîd e ku li jêr xuya dike

(Sven Hedin, Öfver land till Indien, 1910, rûp.109- Rohat Alakom)



Gorî Qanadê Kurdo, di navbera salên 1940-1985an da li Sovyetê qasî 75 têz li ser kurdan hatine amadekirin:

Dîrok, etnografya...38
Edebîyat, folklor.....18
Ziman, zarava.........19

Hin xebat têzên berendamiyê yên doktorayê, hin têz jî tezên doktorayê bûne. Komek kurdnasên Lenîngradê **(Rohat Alakom)**



# GÊJEVANG, NAVBIRKA REŞ Û SPÎ; HIŞÊ MILLETEKÎ

**SERMEDAR SÎRIÛS**

> *Ez wisa bawer im, sedan sal biçin jî di nav qismekî hizirmend ê kurdan de, dê nîqaş û leca der barê Gêjevang, çawanî û çitohiya wê de her hebe.*




Di kulekekê re pênc pencere… Bo romanekê mirov dikare pênaseke çawa bike? Di pênc pencereyan re kuleke biçûçik… Gelo ev e kurteya romana Gêjevang?

Pênc pencere di kulekekê re; an di pênc pencereyan de kulekeke biçûçik? Tîrêj xwe vedişêre û ji wan pênc pencereyan re ro dibe û dikişe zikê kulekekê.. Tev di zik hev de, pênc co û robar di yek cuhokê re diherikin.

Îja em bên ser mijara xwe. Gêjevang. Bi kurdî derçûye. Navê romanekê ye. Berî ez dest bi xwendina wê bikim, min der barê nivîskarê wê de hinek vekolîn kirin. Hinan digot, “zimanê wî giran e”, min xwend, ne giran lê zimanekî tîr û wekî hingivê parzinandî bû. Bi ser devê min heliya. Hinan digot, “di warê teknîkî de kêmasiyên wê hene”, min dî, ez di nav rist û hûnakeke tekûz, darêtî, xemilî û weribî de digerim.

Her wekî tu navogasyonekê didî ber xwe û ew te bihost bihost di kuçetengên war û rûdanên qewî giran de digerîne. Rêya xwe hîç şaş nake.

**Pênc pencereyên di kuleka Gêjevang de**

**Pencereya yekê:** Hekarê kurê Mehmûd û gêr û gelşa li dora wî. Li vê derê Gêjevangê me, li Devî Latê rûniştiye û li benda Pelşînê disekine. Pelşîn, paşê paşê xuya dibe ku pela darê ye, peleka şîn. Heman wext Pelşîn berdilka Gêjevang e, ku hin caran pê re xuya dike û dîsa jê bi dûr dikeve. Xuya ye, nivîskar li vê derê devê kêra xwe li têkiliyên pênasenekirî yên vê civaka me dike. Di vir de, baweriya mirovan zêde bi hev tune. Têkilî kelê û li ser devê tivengê ne.

**Di pencereya duyan de Gêjevang,** daqulî bîra xwe dibe. Ji me re dibêje, ku em di rastiya xwe de bi tenê nîn in.

Raboriya me wekî sî, hiş û aqilê vê raboriyê jî wekî agir di naxê me de geş û gur e. Em ne tenê aydê xwe ne, em belkî aydê duhî û sed bav pêşiyên ax û erda xwe ne jî. Ango welat qedera mirov e. Gêjevang di vê pencereyê de berê me dide serpêhatiya Ask û Kovî û di cengela wê serboriyê de me gêj dike û bi êşan dikute, dihêre.

**Di pencereya sêyan de Dilsoz,** vê carê berê Gêjevang xistiye dû pêjna dengekî berze û li ber semaha kemana Amîdaya Amîdayî di nav labîrentên teng û tarî yên Siwarên Estêra digerîne. Ev metaforên Dilsoz, rêya têfikirîneke kûr dide xwendeyan. Di vê gêr û gelşê de, Gêjevangê me tebeqeyeka dî ya bîrê diqelêşe û me digihîne serdemên şikestî yên bîra vê axê.




Dîroka bajarekî di ber bayê keftûlefta şerê desthilatê de heriftî, evin û îxanetê di zik hev de, li ser “terîqeke ruhanî ya paralel” a xwe bi navê Siwarên Estêra bi nav dike, tîşkê dide ser roja me.

**Heçî pencereya çaran e,** Gêjevang vê carê serê sedsala çûyî diqelibe û sêdaredan û bêxwedanhiştina Cewer Axayê Şikakî tîne ser sehnê û raberî me dike. Hekarê Gêjevang ku li Devî Latê, li benda hatina Pelşînê ye, niha jî xwe bi dirûvê Mîro ye û di serpêhatiya Cewer Axa de mêvanekî nexwendî ye. Bîra welatekî di bîra Gêjevangê reben de serobinê hev dibe.




**Di pencereya pêncan de Omer Dilsoz,** Gêjevang kiriye mêvanê Cheko Xyanê psîkîyatrîst û pê re derd û kulên xwe derdike. Li vê pencereyê Gêjevang gelekî rehet e û dikeve pey pirsa hebûnê. Pê re pirsa tirs û xwenasînê di teşîya dilê xwe badide û lîr lîr dirêse.

Ev pênc pencere di kuleka Hekarê kurê Mehmûd de xwe rûberî hev dikin û piştî ku di serada Gêjevang de diseridin, di ruhê şikestî yê Askê de di bêjingê dikevin û herî dawî di moxila Hekarê dilşikestî de, di ber moxilê dikevin. Çi dimîne ber destê xwendeyan? Bêguman, gêr û gelşa bîra neteweyekê, kat û demên raboriyekê di yek zeman û zimanî de komî ser hev dibin.

Zemanê Gêjevang, ji spî dest pê dike û şeş kategoriyan ber bi gewrî û gêwiliya reşî ve diçe. Spî di bêjinga reşî de hûrî hûrî dibe û pê re pê re ton û formên di navbera reş-spî de jê peyda dibin. Her dexm û lekeya rengê gewrî nexşeyek ji ruhê Gêjevang û bi wî re beşek ji serpêhatiya bûneweriya wî ya binehişê kulturî ava dike.

Lewre ye, Gêjevang, ne tenê danîna romaneke li ser binemayê kawdan û qewamekê ye, ew heman wext, seridîna bîreka kûr a welatekî ye û perçepincên wî welatî di zik hev de dirêse.

Ji ber vê ye, Gêjevang, di kulekeka biçûçik de pênc pencereyan, di fona şeş reng û navberrengan de li xwe dihewîne, dirêse, radiçîne û tîne raberî sêla sor a kurmancîyeka têr û qelew dike. Zimanekî ter û avî, têra xwe binecî û têra xwe krîstalîzebûyî...




Gêjevang, ne zimanê deverekê an zemaneke kurdîyê ye; bi ya min, ew zar û zemanên kurmancîya reşbelek li teşiya xwe badide û hûrik hûrik lihev dirêse. Çimkî eyarê ferhenga Gêjevang di ser kurmanciya devkî û lawjekî re ye. Ew zimanekî di forma dengbêjiyê de li tenûra bîr û felsefeya vê axê geriyaye û wisa durist bûye.

Gêjevang, tîrêja pênc pencereyan di kulekekê re dide der.

Ez wisa bawer im, sedan sal biçin jî di nav qismekî hizirmend ê kurdan de, dê nîqaş û leca der barê Gêjevang, çawanî û çitohiya wê de her hebe. Çu carê du kes dê li ser vê berhemê heman tiştî nikaribin bibêjin çimkî bara hemû aqilan, bara hemû hizran tê de xuya dibe. Heta heman kes gava du caran lê vegere dê du bîr û boçûnên ji hev cuda cuda bibêje.

Lewre ye, bi ya min, Gêjevang fênomeneke taybet e û çawaniya hizirtêkirina "aqilê kurdî" raberî me dike. Li me û li zimanê me pîroz be. Piştî Gêjevang ne bawer im çiraya vî zimanî vemire.

# BI ÇAVEKÎ ZANISTÎ GERDÛN Û EM

XALID CELALÎ



Çi ew roj dûrî mirov tên û weke tiştek efsûnî dikeve bîra mirov û êdî ne mimkun e em li wan rojan vegerin. Belê, em ji zarokatîya xwe dûr dikevin û ev wext li me gelekî dirêj tê. Lê dema mirov emrê xwe difikire ku bibe dora 80 salan ev jî hinekî zêde ye... Gelek bîr û bawerî, xweşî û nexweşî, xerîbî û gihêştin di emrê me de ne û bi qasî dinyayekê li me dirêj tê.

Lê em hinekî din jî paşve biçin û bifikirin sedsal û dewr û dan derbas bûn ji kalikên me heta niha. Em paşvetir biçin û li emrê mirovahîyê binêrin ku bi qasî tê zanîn dora 195 hezar salan e, ev jî demek dirêj e.

**Dema zarokatî tê bîra me çi kelecanek dikeve dilê mirov. Xewn û xeyala her kesî ye ku dîsa li wan rojên berê yên weke bihuşta ser dinyayê vegere**

Êdî hizirkirina salan li me zehmet tê lê divê em hinekî din jî biçin û li mala mirovahîyê yanî li dinyayê binêrin ku emrê wê nêzî 4,5 milyar sal e. Va ye em nêzî destpêkê bûn; emrê gerdûnê jî tê texmînkirin ku dora 14 milyar salan e. Belê berîya 14 milyar salan dest pê kir her tişt û ji zarokatîya me dûrtir e ev dem... Vêca ka em binêrin em li ku dera van 14 milyar salan e û em ber bi ku ve diçin. Sebr bikin ev lê lê yê hêj lo lo maye...

## Roj û gerestêrkên di rêgeha (yörünge) wê de... (ya herî dûr Pluton e û êdî ew weke gerestêrk nayê qebûlkirin)

Di gerdûnê de bi giştî em li Gakaksîya Kadizê(samanyolu) ne û di vê galaksîyê de li Rojbend anku Sîstema Rojê, di gerestêrka (gezegen) Dinyayê de dijîn. Rojbend, navê xwe ji rojê digire û 8 gerestêrk di vê sîstemê de li dora rojê digerin.

Gerstêrka herî nêzî Rojê, Zawe (Merkûr) ye û piştî wê Gelawêj/Venûs, Dinya, Merîx/Mars, Berçîs/Jupiter, Astan/Satûrn, Ûranûs û Neptûn hene. Li dora van gerestêrkan bi qasî tê zanîn 166 peyk(uydu) hene.


Peyka dinyayê ya yekane û xwezayî Hîv/Heyîv e. Hîv, hem li dora xwe û hem li dora dinyayê dizîvire û her du zivirînan jî di 27,3 rojan de temam dike, lewma em her dem rûyekî hîvê dibînin.

Peyka dinyayê ya yekane û xwezayî Hîv/Heyîv e. Hîv, hem li dora xwe û hem li dora dinyayê dizîvire û her du zivirînan jî di 27,3 rojan de temam dike, lewma em her dem rûyekî hîvê dibînin.

Di gerdûnê de galaksî ewqas ji hev dûr in ku mesafe bi saletîrêjan(sala ronahiyê) tên pîvan. Leza ronahîyê di valahîyê de 300000km/sanîye ye(di sanîyekê de sêsed hezar kîlometre), yanî di salekê de ronahî 9,5 trîlyon km mesafe diçe û bi vê yekê saletîrêjek dibe 9,5 trîlyon kîlometre.

Roj, ji me 150 mîlyon kîlometre dûr e û ronahîya Rojê di nêzî 8 deqîqeyan de digihê me. Yanî ew tava dinyayê ronî dike û laşê me germ dike, dema em li ser laşê xwe pê dihesin, ew ji berîya 8 deqîqeyan ji rojê derketiye û hêj nû gihêştiye dinyayê





Roj û gerestêrkên di rêgeha (yörünge) wê de... (ya herî dûr Pluton e û êdî ew weke gerestêrk nayê qebûlkirin.)

Wek tê zanîn Dinya, li dora xwe dizîvire û bi hevalbendên xwe yên di sîstema Rojê de jî li dora Rojê digere û rojbend bi tevahî jî di Kadizê de di rêgeha xwe de digere. Yanî sîstema Rojê bi xwe jî rêgeheke taybetî xwe di galaksîya me de heye û roj bi gerestêrkên xwe ve di wê rêgehê de bi lezeke mezin diçe. Dinya li dora xwe bi 1670km/saet lez dizîvire û li dora Rojê bi 108 hezar km/saet dizîvire û rojbend jî di rêgeha xwe de bi 720 hezar km/saet lez diçe herçiqas leza rojbendê di Kadizê de ewqasî zêde ye jî tê pêşbînîkirin ku ew ê zîvirîna xwe di 230 milyon salan de temam bike. Yanî dema em vê nivîsê dixwînin û haya me ji tiştekê nîn e; em hem li dora dinyayê hem li dora Rojê hem jî di rêgeha rojbendê de bi lezeke mezin diçin...

Çi tiştek ecêb e ne wisa? Lê ewqas şaş nebin, hêj ya mezin maye!

Li gor lêkolînan galaksî jî ji hev dûr dikevin. Yanî Kadiza me jî di gerdûnê de ber bi alîyekî ve diçe. Dema em ji rojbendê derdikevin û li galaksîya xwe dinêrin mezinahîyeke bêhempa derdikeve holê ku ji alîyekî Kadizê heta alîyê din 150 hezar saletîrêj in û roja me jî ji navenda Kadizê 25 hezar saletîrêjan dûr e.




Galaksîya Kadizê û Rojbend(Sun)

Li gor zanyarîyan çêbûna gerdûnê bi Teqîna Mezin(Big Bang) dest pê kiriye û emrê gerdûnê jî dora 14 milyar salan e. Dîsa li gor lêkolînan piştî teqîna mezin heta niha gerdûn her ku diçe fireh dibe. Di sedsala bîstan de Edwin Hubble, tesbît kir ku galaksî ji hev dûr dikevin û gerdûn fireh dibe.

Lê ev nayê wê wateyê ku her tişt ji hev dûr dikeve. Wek mînak em bêjin di rojbenda me de her tişt di bin bandora rakêşa (kütleçekim) rojê de ye û ji wê dûr nakevin. Roj û hemû stêrkên din jî di bin rakêşa galaksîyê de ne û galaksîyên nêzî hev jî di bin bandora hev de dimînin û weke kom tevdigerin lewma ev jî ji hev dûr nakevin, lê belê komên galaksîyan ên cuda ji hev dûr dikevin û firehbûna gerdûnê jî li vir dest pê dike.



Komên galaksîyan ji 50 heta 1000 galaksîyan pêk tên.

Tê pêşbînîkirin ku galaksîya me û galaksîya bi navê Andromeda di nava 4 milyar salan de bihigên hev, li hev bikevin û piştî lihevketinê ji ber hêza rakêşê jî ew her du bibin yek galaksî.

Ji ber ku Andromeda bi 396000km/saet lez ber bi galaksîya me ve tê û rojbenda me jî bi 1098000km/saet lez ber bi wê ve diçe. Li ser vê mijarê çend fikrên cuda hene, lê nayê zanîn ka dinyaya me hingê xira dibe yan jê difelite.

Ji bo sîmûlasyona Kadizê û Andromedayê lê binêrin:
https://youtu.be/4disyKG7XtU

Lê dîsa jî hûn vê yekê ji xwe re nekin xem, ji ber ku emrê me têra dîtina vê tiştê nake. Mirov dikare bêje çawa ku em rojekê tên dinê, piştî zarokatîyê mezin dibin û ber bi mirinê ve diçin; gerdûnê jî bi teqîna mezin dest bi vê rêwîtîyê kir û niha ber bi mirinê ve anku xirabûnê ve diçe, lê emrê wê hinekî ji yê me zêdetir e. Belê, di gerdûnê de her tişt ji hev dûr dikevin û em jî ber bayê gerdûnê ketine û her ku diçe ji hev dûr dikevin. Bi hêvîya rojeke ku em jî weke Kadiz û Andromedayê bigihên hev û bibin yek...

Jibo piştgirîya peyvan:

https://play.google.com/store/apps/details?id=com.wqferheng

Jibo wêne û zanyarîyên teknîkî:https://www.wikipedia.org

# ENDÎŞE (FIKAR- METIRSÎ)

WERGER: CÜNEY YAZICI



Jiyan bê endîşe nabe, di jiyana me de, carinan rewşên bi endîşe rûdidin; ev rewşa bi endîşe, tiştekî asayî/narmal e. Bi rastî, endişe, ji bo berdewamkirina jiyana rojane, hesteke pêwîst e û ji bo ku em jiyaneke bi serfirazî berdewam bikin, me hêzdar û konsantre jî dike.

Însan, ji her asta jiyana xwe de li rastî pirsgirêkên ku li hêviya çareserkirinêne tê. Endîşeyên rojane jî, yek ji wan pirsgirêkan e. Xêncî endîşeyan di jiyana însanan de, yên ku dibin sebeba endîşeyan hinek pirsgirêkên din jî he ne.

Mînak: Fikara ji serfiraziya perwerdehiyê, pirsgirêkên rojane, biryargirtinên girîng, zewac, nexweşî, mirin...hwd.

Di jiyana me de, pirsgirêkên ji endîşeyan, cîhekî taybet digrin; em dikarin bêjin ku : “kesekî bê endişe tune û ji endîşeyan re jî tu sînor tune.” Ango, endişeyên di jiyana însanan de bêhejmar in.

Asta endîşeyan bi pirsgirêk û dema wê xwe re eleqedar e. Li gorî pisporan, ferqa însan û heywanan yek jî endîşeyê ji pêşerojê ne.

Gelek bûyerên ku ji bo me dibin sebebê endîşeyan, heman demê de ji bo çareserkirina pirsgirêkan, me konsantre û hêzdar jî dikin. Gava ku em bi erênî bifikirin û ji bo pêşerojê planan bikin, endîşeyên me jî kêmtir dibin. Pirsgirêkin ku dibin sebebê endîşeyan, carinan yên honandî ne.

Bûyerên ku pêkhatina wan îhtîmaleke biçûke jî em ji wê endişe dikin. Lêbelê bûyerên ku me di mêjiyê xwe de honandine, yên rasteqîn kêmtir diqewimin. Lewra planên me yê ji bo pêşerojê hene û gelek bandorên ku yê derkevin pêşiya me jî, em hesab nakin. Mînak: Em bi gelemperî bi endişe ne , gava ku eqrabeyekî me dimire, em dibêjin: ”Gelo em ê bi xemgîniya mirina vî xizmê xwe, çawa bijîn?” lê paşê diyar dibe ku, gava xizmên me dimirin, em bi awayekî bi lez hînî tunebûna wan dibin. Ev dide nîşan ku, xeyalên di mêjiyê me de, wext tê li hember rastiyan têk diçin.

Em nizanin ku, emê li hember bûyereke honandî an jî li hember bûyereke rasteqîn çawa bifikirin û wan çawa binirxînin. Divê em ji ber xeyalan nekevin fikaran û ne pêwiste ku em ji ber xeyalan xemgîn bibin.

Mixabin, mêjiyê me bi gelemperî ji bûyerên xemgîn re amade ye û zêdetir neyênî difikire.

Dibe ku ya em xeyal dikin, gava ku qewimî, bi hêsanî bê pêşwazîkirin û bi awayekî normal bê çareserkirin. Fikar/endîşeyên xelet bi zirar in, gava ku em bi endîşebin mêjiyê mi dikeve rewşeke awarte; ji ber vê yekê,çav mezintir dibin, dil bi lez diavêje, xwedan destpê dike... hwd.

Bûyera ku em jê endîşe dikin, tişhekî honandî be, ne pêwiste ku em ji bo çareserkirina wê têbikoşin an jî ji wê birevin, eger em wisa bikin bandora endîşeyan dê dubare bibe û dibe ku em li pêşerojê rastî wê pirsgirêkê bên.

Tenê xeyal, têra başfamkirina pirsgirêka nake, heyanî mirov rastî pirsgirêkekê neye, nikare pirsgirêka baş fahmbike. Her însan bi hestên xwe ji însanê din cûda ye. Hinek endîşe tên hînkirin, hinek ne ji destê me ne; hinek ji me rewşa herî xerab difikire, ji henek me jî zêdetir bi awayekî erênî difikire.

Endîşe hesteke normal e, lê belê jiyana me ya rojane de dibe sebeba astengiyan. Ji bo ku jiyana însanan a rojane de nebe asteng, divê bê tedawîkirin. Pispor/doxtor wiha dibêjin: “însanên zêdetir bi endîşe divê bên tedawîkirin, lê belê divê însanên me çareseriyê di dermanan de nebînin, derman ne çare ne..

# DIRÛNKAR

AMADEKAR: PAŞA AMEDÎ



“Ez jî bilbilê te bûm, te min kuşt. Sêhêr ji ber wê xerab bû, xwesika te di dirûna çekan de derziya dostaniyê bernedaba. Êzingvan pir berxwe dikeve, piştê vê gotinê hima ji wir derdikeve û dihere. Çimkî tiştekê wî yê ku bigotana êdî nemabû

Zilamek ciwan dirûnkarekî baş bû. Makîneyek dirûnê û dikaneke wî yê biçûk hebû. Heya sibê dixebitî û gelek hewl dida lê pere pirr qezenç nedikir. Şevekî demasala zivistanê yê pir sar de dikana xwe digre û dere malê, lê dikanê sobeya ceyranê yê pêxistî jibîr dike; ew dikana wî dişewûte. Êdî ne pere û ne jî karê wî dimîne.

Bi rojan li karekî digere lê tu karek nedît...hemaltî kir, firaxşotî kir...çi kar kir perê kirêya xwe jî dernedixist. Sebra xwediyê malê jî nemabû, paşê bi tena bawûla xwe li kuçê ma.

Demsala zivistanê di sira sermayê de cih tunebû ku xwe bavêtana û têde xwe bistranda. Mala wî tenê kuçe û baxçeyên bajêr bû.

Ji birçîbûnê û sermayê taqeta wî tunebû ku li kar jî bigeriya. Bi halê birçî û bizar li textebendê parkê rûniştibû. Erebeyek mezin li nêzê peyarêya parkê sekinî. Ajotvan deriyê paş erebê vekir; kalik bi qahrokî tehn ajotvan da û jê re “ Min tenê bihêle, bîstekî li parkê bigerim belkî hindik hêrsa min dakeve.”

Bi herhalî ve eşkere bû  ku yextiyarek dewlemend bû. Çend gav şûnda li ser bankê dirûnkarê dilerizî dît. Nişkave hêrsa yextiyar çûbû ji xwe re, got: “Zilamê reben çawa qefilî ye, çawa alîkariya wî bikim ku ji vê rewşê xelaskim.” û ket fikarê. Dirûnkar jî bi baldarî li sakoyê yextiyar mêze dikir. Lêbelê heşê dirûnkar ne germiya sakoyê bû. Difikiriya; pirtiyê baş û qalind tew li bejna kalik nedihat û li gor bejna wî nehatiye dirûtin...

Kalikê dewlemend nêzê dirûnkar bû, jê re:

-Çi ye ewlad, di vê sir û sermayê de li parkê cemidî yî, bixwazî sakoyê xwe bidime te.”

Dirûnkar:

-Naxêr, mala te ava. Tenê difikirim ku ev sako li gor bejna te nayê, bi xweşik nehatiye dirûn. Him qalind e û him jî te qelaw dide nîşandan.

Kalik vê bersivê digre, diheyîre û şaş dibe. Çimkî ew jî zanibû ku evqas pirtiyê buha tew li bejna wî nayê.  Kalik jê re, got:

-Malneketo! Di sermayê de ewqas dilerizî çawa berbayê vê sakoyê ketiyî?

-Çimkî ez dirûnkar im.

Li ser vê bersivê. Jê re:  “Bi min re were, çîroka xwe di rê de bibêje” û wî dixe erebê.

Ev pêşewazî jiyanek guherandiye. Yextiyarê xêrxwaz yê bi sal ber zilamê ciwan û huneriya wî ketibû; nexwestiye ku bê kar û bê xanî bimîne. Li gor buhayê dikana biçûk pere daye ku dirûnkar ji xwe re dikanek veke, li hemberê vê jî dirûnker jê re cil û çekên wî bidrû.

Dirûnkar jî bi kelecanî dest bi karê xwe kir. Weka dîna dixebitî. Di wê navberê de zilamê bi sal destekê jî didiyê; bi nasên zengînên der û dora xwe re dide naskirin. Jê re sparîşan peyda dike.  Dikanê biçûk êdî dibe modaxane, bi markayên mezin re dixebite. Êdî bibû karsazekî navdar.

Rojekê zilamê kal çûye seredana dirûnkar. Dirûnkar jî ji bo ku malên xwe li dervayê welêt bifiroşe û bi wan re têkildar bibe  di wê gavê de gere xwe bighîjîne saeta teyarê lê dem hindik mabû.

Wexta bi zilamê yextiyar re sohbet dikir; wê gavê çima yextiyar bi nexweşiya giran nakeve û dikeve erdê. Rewşa wî xerab dibe bangê ambulansê dike, wî dişîne nexweşxanê. Karsazê nû nexwestiye ku ji karê xwe yê derve bibe, bi lez  gîhaştiye teyarê û çûye dervayê welêt.

Yextiyarê bi sal qeyrana dil derbas kiribû û gelek roj di nexweşxaneyê de ma. Yextiyar xwestiye ku karsazê nû rojekê  jê

re têlefonê veke û halê wî bipirse an were seredana wî. Tim li bendê karsazê nû bûye. Dirûnkar jî geh li vê ge li wî ciyê bû; karê xwe didomand wext nedidît ku halê yextiyar pirs bike. Di wê navberê de gelek dem çûbû... dixwest ku zilamê yextîyar bibîne lê ji ber ku gelek dem çûbû ji fedîkirinê nikaribû here seredana wî.

Gelek dem şûnda karê dirûnkar bi rêve nediçû. Mecbûr mabû ku febrêqeyên xwe bigre, paşê tenê di destê wî de weka berê dikanek biçûk ma. Ku rewşa wî teng bû, bi eciziya xwe û bi fedokî bi lez û bez çû cem yextiyar ku jê bipirse ka li ku xete kiriye, ku karê wî rast bibe û dîsa zengîn bibe.

Yextiyarê dilşikestî û bixemsarî dirûnkar qebûl kiriye ku were cem wî lê yextiyar jê xwestiye ku piştê vegotina çîrokê divê ew zû ji cem wî here. Çimkî êdî nedixwest ku wî bibîne û pê re qise bike. Û dest bi çêrokê kiriye:

“ Di demekî de êzingvanekî belengaz hebûye. Di nav darîstaneke de holika wî hebû û debara xwe bi êzingan dikir. Rojekê di holika wî de şewat derdikeve û darîstan tev bûye xwelî. Ji ber wê gelê dewerê tu kes pê bawer nedibû, kesekî kar nedidayê. Ew jî çixina xwe digre li kera xwe siwar dibe û dikeve rê ku ji wî welatî here.

Di nav daran de peyatî diçû. Bi dengekî bangkirinê dibhîze serê xwe bi hêla deng ve diguherîne, dibîne ku bilbil e. Bilbil jê re got: “ Bi halê te pir xemgînim, niha sêhêrek wer li kera te bikim ku ji vê demê şûnda wê kera te pirxweş kilaman bibêje, bi pêşanêya kerê tu yê pere pir qezenç bikî.”

Bi rastî jî ker dest bi strana kir û kilamên pir xweş digot. Êzingvan bajar bi bajar geriya, kilaman bi kerê dida gotin. Her kes berhev dida ku li kerê temaşe bike. Êzingvan û kera xwe li welatan bi nav û deng bûn. Rojekê ji ber ku xwe zû bigihîjîne pêşnîşanê ketibû rê; di rê de diçû.

Bûye hawara bilbil; pisîkek bi bilbil girtibû ku bilbilê bixwe. Êzingvan xwest ku here alê bilbilê bike, sekinî ku wê ji pisikê xelas ke, dudilî bû, ponijî ku lê ji pêşnîşanê bibe wê gelek pere ji destê wî here, poşmam bû dev ji bilbilê berda. Qet paş xwe jî mêze nakir, bi lez ji wir direve. Xwe digihîjîne pêşnîşanê, kerê xwe amade dike û dest bi kilaman dike lê dengê kerê diguhere dibe zirezira kerê. Gel dîbîne ku êzingvan mirova dixapîne û hicumê wî dikin. Êzingvan rezîl û riswa dibe, xwe bi zor ji destê gel difilitîne. Êzingvan wê gavê êdî fehm kiriye ku bi mirina bilbilê sêhêra wê çûye.”

Yextiyar çîroka xwe diqedîne jê re, got : “Ez jî bilbilê te bûm, te min kuşt. Sêhêr ji ber wê xerab bû, xwesika te di dirûna çekan de derziya dostaniyê bernedaba. Êzingvan pir berxwe dikeve, piştê vê gotinê hima ji wir derdikeve û dihere. Çimkî tiştekê wî yê ku bigotana êdî nemabû.

# JI BO RÛYEKÎ BIRQOK EM ÇI BIKIN?

## WERGER: CÜNEY YAZICI



**Di van deman de dibe ku rûyê we hişk û bêruh be. Sedema wê zivistan û hewaya sar e. Lêbelê hûn dikarin rûyê xwe bibiriqînin û sihetê bidinê. Ji bo rûyekî bi sihet, zindî û birqok, tiştên ku divê hûn bikin ev in:**

- Ji bo ku hûn ji hişkbûna çermê xwe xelas bin, divê hûn nermkeran li çermê xwe bidin û hûn dikarin maskeya rûyan jî bi kar bînin.

- Gava mirov bi aveke pir germ serê xwe bişo, rûnê siruştî yê laşê mirov jî bi wê ava germ diçe. Divê ava ku mirov serê xwe dişo pir zêde germ nebe.

Divê hûn di zivistanan de nermkeran pir bi kar bînin. Nermker dê sihetê bide çermê we û nehêle ku çermê we biterike.

- Her tiştên ku tê de wîtamîna Cyê heye, dê rûyê we zindî bike. Di vê demê de wîtamîna Cyê, pir bixwin. Rûnê gûza hindê jî, ji bo çermê we gelek baş e.

# HELBESTÊN DILAN

## AXA KURDIKÎ Û MIHEMED HESKO




Bo min şahî û xweşî
Ey zarê min Kurmancî
Gelek şîrîn û xweş î
Weka kakil û kuncî

Şekir, hingiv û dims î
Av, dew û nanê tisî
Genim, nok û garis î
Mişmiş, tirî w narinc î

Tu hem gul û kulîlk î
Hem evîn û berdilk î
Tu hem mal û hem milk î
Neyar ji te bihecî


Pîroz î ji her tiştî
Ez Nûh im tu jî geştî
Dêr, mizgeft, heman tişt î
Qudsa Şerîf û Hec î

**Axa Kurdikî**
**31.07. 2020**

Tenê bo te..!
Payeyên balkêşiyên hestan çokên xwe dînin
Û xwedawendên viyanê
Ên ku li sîbera bedewebûna te
Hîştin ku derbirîn rabiper e
Û rewanbêjî nikaribe xwe rabigihîn e
Û nikaribim ji ber navgiranî
Û tîrêjên awirên çavên te birevim?
Çavên te yên ku, hemû wateyên rastî û dilpakî yê
Û rengên pêşerojê û nameyên yekbûnê
Tevî bawrmendiyê di xwe de hewandin e
Û bawerî bi girnijînek e di dil de, peyveke matmayî ye?
Herwiha çavên te, dînîtîya dildarî yê jî dikolin
Û xêza pevgihîna lêvan
Çîrokên Sirat Elmisteqîm, dibêjin
Kengî dil û can ew katane ezberkirin..!
Wê ji dojeha bêparî
Û xweşiya ramûsana herdu lêvan rizgar bibe!?

**Mihemed Hesko (birasoz)**

# Diljen Ronî




Diljen Ronî mirovek pir alî ye. Alîyekî wî bijîşk e û alîyê din jî muzîsyen e. Van her du karên xwe jî bi awayekî serkeftî dike. Bi bijîşkîya xwe pirsgirêkên alîyê fizîkî û bi muzîka xwe pirsgirêkên manevî û ruhanîya gelê xwe derman dike.

## BIJÎŞKEKÎ JÊHATÎ Û DENGXWEŞ: DILJEN RONÎ

Li vê jîyanê hin kes hene bi pir alîya xwe ji civaka xwe re dibin ronahî, ji ciwanên gelê xwe re dibin rêber û bi xebatan xwe asta gelê xwe derdixin asta şaristanîyê.

Li vê jîyanê hin kes hene bi pir alîya xwe ji civaka xwe re dibin ronahî, ji ciwanên gelê xwe re dibin rêber û bi xebatan xwe asta gelê xwe derdixin asta şaristanîyê. Yek ji wan camêrên serkeftî û hêja Diljen Ronî bi xwe ye. Diljen Ronî mirovek pir alî ye. Alîyekî wî bijîşk e û alîyê din jî muzîsyen e. Van her du karên xwe jî bi awayekî serkeftî dike. Bi bijîşkîya xwe pirsgirêkên alîyê fizîkî û bi muzîka xwe pirsgirêkên manevî û ruhanîya gelê xwe derman dike. Me pirsên xwe ji canabê wî kir û wî jî bersiv da pirsên me. De ka kerem bikin em hunermendê dilezîz Diljen Ronî ji nêz ve nas bikin.



**Jîyana te bala gelek mirovan dikşîne. Tu hem bijîşk î û hem jî muzîsyen î. Tu van her du karan jî bi awayekî serkeftî dike. Jîyana te jîyanek serkeftî û mînakek bê hempa ye. Tu dikarî ji me re qala jîyana xwe bikî, Diljen Ronî kî ye?**

Ez di sala 1981ê de li Cizîra Botan ji dayîk bûme. Zarokatîya min li Cizîrê derbas bû. Di sala 1993an jî mala me hat Amedê. Min li vê derê dest bi lêdana tembûrê kir. Piştî xewndina lîseyê min li zanîngeha Yuzuncu Yilê Bijişkî xwend. Di wan salan de fêrbûna gitarê û gav bi gav di ber avakirina muzîk û helbestan ve diçûm. Bi hinek komên zaningehê re min xebatên xwe çêdikir. Piştî zanîngehê ez dîsa hatim Cizîrê, hatim welatê bav û kalan min xizmeta Bijişkîyê kir. Her wiha li ser muzîkê jî xebatên min hebûn û di sala 2008an de min albûma xweya yekem ya bi navê “Çend Gotinên Evînê” derxist.

Bi rastî gelek hat ecibandin. Di nav albûmê de stranên Nesrîn, Kanî û Awîrên Esmeran bi serket. Piştî çend salan 2012an de albûma min ya duyemîn "Du Demsal" derket. Piştî van herdu albûman min navbeynek da muzîkê. 2017an bi tevahî ku ji stranên klasîk pêktên albûma "Çile – Klasîkên Kurdî" ji aliyê Kom Mûzîkê derket. Paşê 2018an albûma min ya dawî "Xewna Derew" derket.

**Evîna muzîkê kengî di dilê te de şax veda û ev çend sal in tu karê muzîkê dikî?**

Ez bawerim 12 salî bûm fêrî temburê bûm. Lê belê hê ez zarok bûm tembûr bala min dikişand. 12 salî heta îro ev 27 sal e lê bi aweyekî profesyonelî ev bû 11 sal ez karê muzîkê dikim.

**Di vê rê de kîjan mirov û kîjan sazî ji te re bûne alîkar?**

Ez dikarim bibêjim ez bi xwe bi xwe fêrî tembûrê bûm. Lê belê di çêkirina albûma yekê de hevalê min Seyîthan Kizil bû alikar û rê li pêşîya min vekir. Û her wiha aranjorê min Ayhan Orhuntaş jî kedek mezin daye û hevaltîya min kirîye. Heta îro tu sazî ji min re nebûne alîkar kû ez bi serê xwe bi qeweta xwe hatime heta îro.

**Dema te biryar da tu yê albuma xwe derxînî ji malbat û derdorê çi bertek ji te re hate dayîn? Di derxistina albuman de ji te re bûne alîkar?**

Yanî hin kes bûne alîkar lê belê malbata min çêtîr dixwest ez di karê bijişkîyê de bi serkevim. Di derxistina albûmê de ji aliyê aborîya albûma yekem birayê min alîkarî da min û wekî din min hemû albûmên xwe bi qewet û keda xwe çêkir.



**Tu ji kîjan terzên muzîkê û ji kîjan muzîkjenan hez dikî? Bêhtir kijan muzîsyen li ser te bandor çêkirine?**

Ez ji rockê hez dikim. Ciwan Haco, Leonard Cohen, Bryan Adams, John lennon, Santana û Jimi Hendrix.

**Muzîka tu îcra dikî bi temamî ne klasîk û ne jî modern e; te hem ji rengên klasîk û hem jî ji rengên modern li muzîka xwe zêde kirîye. Van her du rengan jî bi awayekî serkeftî îcra dikî. Tu dikarî ji me re behsa terza muzîka xwe bikî?**



Zor spas dikim. Herdem dibêjim jîyana mirov û serpêhatîyên mirov rêya muzîka klasîk û modern vedike. Bandora Cizîra Botan gelek li s er muzîka min heye ku ez bi stranên M. Arif Cizîrî mezin bûme. He r wiha Meryemxan, Mihemed Şêxo, Miradê Kinê û hwd. Aliyekî min jî bajarîye. Yanî bandora jîyana bajarî jî li ser muzîk û helbestên min hene. Di albûma min ya "Xewna Derew" de hûn dikarin vê bandorê hîs bikin (bîbînin).

**Muzîk hem ji sîyasetê û hem jî ji wêjeyê, hem ji çîrokê û hem jî ji dîrokê bi bandortir e û van hemû disîplînan jî di hundira xwe de dihewîne. Tu li ser vê yekê çi difikirî?**

Ez dikarim bibêjim ku tu dikarî bi muzikê bigihêje zarokek 3 salî heta mirovek 70 salî.

Belavbûna wê ji hemû cureyên çandê zêdetir e. Ji ber ku melodî diçe mala wan hemû kesan. Helbest siyasî be jî wê helbestê zarokek 3 salî jî guhdardike. Minak gelek efsaneyên me bi rêya dengbêjî hatine heta îro. Dengbêj ji bo çand, huner û hebûna zimanê kurdî re bûne pir û parastina wêje û dîrokê.

**Her stran xwedî çîrokek e. Strana "Diltolaz" çawa derket meydanê? Tu dikarî ji me re qala çîroka wê bikî?**

Ciwantîya mirov di eşq û hevaltî û carna jî di diltolazîyê de derbas dibe. Carna gelek mirov dil dişkîne ji ber diltolazî lê paşê aqlê mirov tê serê mirov wê demê jî dereng dibe. Strana Diltolaz min ji bo ciwanan nivisandîye.

**Herkes dikare stranan bibêje û bibe hunermend?**

Herkes dikare stranan bibêje lê hunermendî tiştekî din e. Afirandina stran û helbestên xurt ne tişteke hêsanî ye.

**Bi te muzîka Kurdî niha di çi astê de ye?**

Mixabin hê ji me re wext lazim e. Ji ber ku gelek sedem hene.

Azadîya muzîkê, azadîya rihnasî, serbestîya ziman, şert û mercên sîyasî, aborî, kêmasîya çapemenî û reklamê. Kêmasîyên her alîyekî pêşveçûna muzîkê girantir dike. Ez bawerim fêr bûna muzîkê û bikaranîna ziman çiqas pêşve biçe ew qas wê hemû cureyên hunerê pêşbixe. Belavbûna bikaranîna ziman pirr muhîm e.

**Di nava albumên muzîka kurdî de ya herî bêtir li ser te bandor kirî kîjan bû? Hemû albumên te serkeftî ne lê dîsa jî dixwazim pirs bikim: kîjan albuma te berdilka dilê te ye?**

Albûma Ciwan Haco Dûrî, Bilûramin û Sî û Sê Gule. Ya dilê min klasîk M. Arîf Cizirî Yar Gewrê ye.

**Berê komên muzîkê hebûn û piştre her muzîkjen ji komê vediqetîyan diketin ser rêya xwe. Niha komên muzîkê kêm bûne, heta meriv dikare bêje ku nemane. Li gorî te sebeba vê yekê çi ye?**

Dibêjin ku ji bo ji hev veqetinê hebûna koma heye. Wek min gotî muzîka kurdî aborî jêre lazim e. Çêkirina albûman ne hêsan e û konser kêm in. Bazara muzîka kurdî kêm e. Ji bo vê yekê jî afirandina koman û berdewamîya koman pirr zor e.

**Te ji gelek helbestan re beste çêkirîye û ew kirine stran. Gelo têkilîyek çawa di navbera helbest û muzîkê de heye?**

Helbest jîyan e muzîk jî dêngê jîyanê ye. Carna peyvek bi serê xwe çtişt îfade nake lê bêlê bi melodîk wê peyvê bistrênin wateya wê û tesîra wê mezintir dibe. Ez bawer im nava vê vedike ji bo hestan û peyv jî li serê wê rê rehetî dimeşin.

**Hin kes hene tenê stranbêjîyê dikin û tiştekî naafirînin. Tenê keda muzîka kurdî dixwin û ev kes jî ne meqam dizanin û ne jî dengê wan xweş e. Lê gava li medyaya civakî meriv binêre bêtir şopînerên wan hene û muzîkên wan bêtir tên guhdarîkirin lê ligel vê yekê muzîkjênên baş kêm tên guhdarîkirin û şopînerên wan yên hesabên medyaya civakî jî kêm in. Gelo sebeba vê yekê çi ye?**



**Meriv çawa dikare muzîka baş û ya xirab ji hev veqetîne?**

Ji bo guhdarvanan deng, hest û bikaranîna amurên klasîk ez bawerim çêtir bala wan dikişîne. Lê belê her dem mirov dikare bibêje bikaranîna amûran, bingeha muzîkê bi aranjeyeke serkeftî û profesyonelî û herwiha bi helbesteke xurt ez bawerim wê ne xirab be. Lê belê muzîka xirab ji bo hin kesan başî ye.

Ji ber ku em tiştên nû diafirînin; berhemên nû û modern. Jê re wext lazim e ku bigihêje herkesî û em muzîka rojavayî çêdikin ez bawerim yên vê muzîkê hez dikin kêm in. Ez bawerim ew demê bê ku kurd wê gelek ji muzîka modern hez bikin. Stila Rock, pop, reggae, jazz û hwd.


**Muzîka Kurdî dikare zikê xebatkarên / xizmetkarên xwe têr bike? Hunermendekî/e Kurd dikare bi muzîka xwe jîyana xwe bi rehetî bidomîne?**

Na. Mixabin nikare. Hin kes hene diçin dawetan belkî ew tişteke qezenc dikin. lê ez dizanim kû heçîyê ku armanca wî hiş û hizrê wî li ser muzîka baş be yanî derdê wî muzîk be ew qezenc nake lê belê feydeke mezin ji bo muzîka kurdî dide.

**Ji bo muzîka kurdî bi pêş bikeve çi pêwîst e?**

Ya herî pêwist ew e ku pêşketin û bikaranîna ziman û fêr bûna ziman e. Eger em zimanê xwe çêtir di jîyana xwe de bikarbînîn em ê çetirtir guhdarîya muzîka kurdî bikin û jêhezkirin wê baştir bibe. Ji xeynî vê yekê divê berhemên profesyonel û cûda bê
çêkirinYek din jî aborî ye. Mixabin hê jêre wext lazim e. Ez jî li ser vê fikrê me ku muzîkeke bi qelite û profesyonelî bi kar bînin wê çetirtir bibe. Mirov di muzîka cihanê de jî vê dibîne û muzîkên amator sernakevin klîbên xurt û muzîkjenên xurt serdikevin. Helbet muzîk divê ji dil be û tesîrekê bide û jê hest kêm nebe.

**Hevpeyvîna Mela Mihyedîn e**



# Mîrzade Sînemxan Bedirxan kî ye?

**KONÊ REŞ**

Ew neviya mîrê Botan, Mîr Bedirxanê Azîzî ye, yê ku di sala 1802 an de li Cizîrê çê bûye û sala 1868 an di sirgûniyê de, li Şamê çûye ber dilovaniya Xwedê. Mîr Bedirxan ê ku di tîrmeha 1847 an de ji Cizîrê hatiye bi dûr xistin û tev jiyana xwe, tevî zarok û neviyê xwe di sirgûniyê de winda kiriye. Tevî ku mîr Bedirxan bi hisreta axa Cizîra Botan bû, lê siltanê Osmaniyan rê nedidayê ku vegere Botan, ne ew û ne zarokên wî..

Belê Sinamxan Neviya kurê Mîr Bedirxan, Emîn Alî paşa ye, yê ku di sala 1851 an de li Stenbolê çêbûye û di sala 1926an de, li welatê Misrê, bajarê Qahîre miriye. Bavê Sînemxan, Mîr Celadet Alî Bedirxan e, yê ku di sala 1893an, di sirgûniyê de, li Stenbolê, çêbûye û sala 1951ê li Şamê miriye..

Diya wê, Rewşenxanim Bedirxan e, a ku di sala 1909an de li Qeyserî çêbûye û di sala 1992 an de li Sûriye, bajarê Banyasê miriye. Rewşen xanim, yekemîn jina kurd e ku bi kurdiya latînî di kovara Hawarê de nivîsandiye.









Sînemxan Celadet Bedirxan, di roja 21ê adara 1938 an de li Şamê çêbûye, ji ber zewacê, xwendina xwe di hiqûqê de nebiriye serî û di roja 22 meha tebaxa 1959 an de bi nivîskarê kurd Salah Sadellah re zewiciye.

Bi salan mala wan li Bexdayê, hem jî li Kerkûkê maye. Li Bexdayê, di bingeha Neteweyên Yekbûyî de İnternationall Schoolê mamostetiya zimanê Fransizî kiriye, û li Kerkûkê beşdrî di avakirina hevgirtina jinên kurdistanê de kiriye, niha malnîşin e (teqawit e).

Bi çend zimanên biyanî dizane wek: Erebî, Îngîlîzî, Fransizî, Almanî û Tirkî, lê zimanê kurdî, zimanê axaftina mala wê ye. Du zarokên wan hene; Azad û Dilnaz, Azad endezyar e wek bavê xwe, niha li Qeter dimîne. Dilnaz, li Parîsê dimîne. ji berî dor sê salan ve mala wan ji Bexdayê hatibû Hewlêrê, niha jî ew li Hewlêrê dimîne.

# JI BO ZAROKAN FEYDEYÊN VEXWARINA ŞÎR

**ZİNDÎWERZAN ZELAL KURDÎ**





Şîr ji zayînê û pê ve ji bo bihêzbûna hestîyan û movikan gelekî girîng e. Ew zarokên ku awayekî birêkûpêk şîr vedxwin yan jî şîremeniyan vedxwin/dixwin ji aliyê gihaştina fizîkî ve ji mirovên din bijûntir in. Ji bo tenduristiya mirovan awayekî baş û birêkûpêk bibe vexwarina şîr, xwarina penîr, xwarina mast û wd şîremeniyan gelekî girîng e.

Şîr hem ji bo zarokan enerjiya laşê peyde dike û hem jî ji bo peydakirina enerjiya wan ya rojane dibe alîkar. Yanê ji bo zarok zû newestin û bi tenduristî bin şîr dibe alîkar.

**Zarokên Ku Şîr Vedxwin Li Dibistanê  Serkeftîtir in**

Şîr feyde nade gihandina laş tenê, di heman demê de feyde dide gihandina zîhnî jî.

Li gorî hin lêkolînan, zarokên ku şîr vedixwin û şîremenî vedxwin/dixwin di dibistanan de ji zarokên din serkeftîtir dibin. Lê belê dîsa jî em nikarin bêjin ji sedî sed sedema serkeftina zarokan vexwarina şîr e. Ji ber ku zarok ji mirovên din birêkûpêktir dixwin û vedixwin. Lewma em nikarin bêjin sedema serkeftina zarokan sedî sed ji qedandina şîr û şîremeniyan e.





**Qewet Dide Pergala jêbexşîyê (Pergala parastinê, bagişiklik sistemi) û Bihêztir Dike**

Di nava şîr de zêdetirî çil (40) qût hene û ji bo şopê, ji bo cemidandinê, ji bo cemidandina qirikê (faranjît) û wd tevahiya nexweşiyên zivistanê baş e û rêjeya destpêkirina wan nexweşiyan jî kêm dike. Bi saya vê ku pergala parastinê bihêztir dike jî zarok zivistanan kêmtir nexweş dikevin. Dema nexweş dikevin jî zûtir ji nexweşiya xwe xilas dibin û kêmtir êş dikşînin.

**Bila Zarok Bi Çawa Şîr Vexwin?**

Piraniya zarokan şîrê di nava çîkokate û kakao de, yan jî di nava tûfirengî (çîlek), mûz û wd fêkiyan de vedxwin. Zarok di şûna van şîrên ku pêzeya tevkirî yanê ku tê de medanên kîmyevî hebin vexwin, biçin şîrên xwezayî vexwin ji bo tenduristiya wan û gihandina wan çêtirîn e.

Ji bo zarokên ku naxwazin şîr vexwin jî mirov dikare fêkiyên xwezayî bikarbîne ku şîr li ber çavên zarokan şîrîn bibe û bi kêfxweşî vexwin. Ji bo tenduristiya zarokan germbûn û sarbûna şîr ne girîng e. Ya girîng ew e ku şîr xwezayî be û tê de medanên kîmyevî tunebin.

Heya giyayîbûna zarokan bikaranîna wan ya şîr wê ji bo tenduristiya hestî û diranan, ji bo bihêzbûna pergala parastinê û ji bo hînbûna xwedîbûneke birêkûpêk gelekî baş e û bandora wê ya erênî heye.

Şîrvexwarin û xwarina şîremenîyan zarokan ya birêkûpêk û heya xamabûna wan ji bo tenduristiya wan û ji bo gihandina wan ya fizîkî û ya zîhnî gelekî girîng e.

Ji ber vê yekê zarokên xwe hînî vexwarina şîr bikin ku zarokên we zû nexweş nekevin. Hûn jî şîr vexwin ku hestiyên we û diranên we saxlem bibin.

*Bê nexweşî û paristî bijîn.*

# EFRÎN; DÎROK Û ERDNÎGARA ZÊRÎN

**FAYSAL DAGLİ**




Efrîn ku ji hezaran salan vir ve wek hêlîna gelê kurd heta roja me hatiye, di heman demê de welatê bapîrê hemû mirovahiyê ye jî. Dîroka jiyana neandertal li Efrînê heta 100 hezar sal beriya me dirêj dibe.

Efrîn navenda herema Çiyayê Kurmanc (Çiyayê Kurmênc) e û li Rojavayê Kurdistanê heremeke sereke ye. Navê heremê ku ji mêj ve wek Çiyayê Kurmênc tê naskirin, di dema Osmaniyan de "Kurddax", di dema frensiyan de "Cebel Ekrad" û di dema Baasiyan de jî wek "Cebel Heleb" hatiye guhertin.

Balkêş e ku Çiyayê Kurmanc li Kurdistanê bi sedan sal in yekta herem e ku bi navê "kurd" hatiye naskirin.


Herema Çiyayê Kurmanc ji ber ku di navbera Derya Spî, Kurdistan û Sûrî de wek pirekî xezayî û xwedî erdîmeke dewlemend e û jî mêj ve bal kişandiye.

Navenda heremê Efrîn li Kurdistanê yek ji cîhên herî kevnarê û xwedî dîrok û bermahiyên dewlemend e. Gelek kevir, zinar, lat û kelehên Çiyayê Kurmanc tevî nav û paşnavê mirovên deverê diyar dikin ku evder bermahîyên ji Hûriya (Horî) ne.

Hûrî yek ji gelên bapîrên kurdan û li heremê yek ji şaristaniya herî kevnare ye.

Pevya Hûrî li herêma Çiyayê Kurmanc di nav gelek kurdan de hîn jî wek paşnav tê bikaranîn. Mînakek din navê Xaldî ye. Xaldî jî ji şaristaniyên Kurdistanê ne. Gelek kes ji herêmên Wêranşar û Serêkaniyê hîn jî xwe wek Xaldî dizanin. Gundê Xalda li Çiyayê Kurmanc yek ji gundên herî navdar û kevnare ye. Dîsa gundên Çiyayê Kurmanc yên wek Bahdîna û Gundê Dimilya, herêmên Bahdînan û Dêrsimê tîne bîra mirov.

Xaka Rojavayê Kurdistanê navenda şaristaniya Hûrrî-Mîtanî bûye û paytexta vê dewletê Urkîş li herema Amûdê li Girê Moza ye. Di demên dawîn de bi taybetî li Rojavayê Kurdistanê; di kolanên li Girê Çaxirbazar, Telberek, Girê Leylan, Girê Mozan û li Girê Fexriya de gelek berhemên kevnarê hatine dîtin, ku heryek vedigerin hezarên salan.




Di sala 1982'an de arkeologên îtalî li nêzî Amûdê rastî Urkîşê hatin. Urkîş ku berî zayînê di salên 3 hezaran de hatiye avakirin yek ji bajarên herî kevn yê mirovahiyê ye. Berhemên ku ji vê heremê hatine derxistin niha li Helebê li Muzexane ya Dêra Zorê de ne.

Li heremê bi sedan deverên kevnare ku li rûyê erdê ne hene. Çend ji deverên kevnarê yên heremê evin: Kela Semanê, Gundê Tîlanîsos, Qesra Beradê, Kefer Nabo, Kîmar, Soganekê, Bircikê Terpê, Dêrmişmîş, Gobelê, Kîlotê, Xerabê Şemsê, Gundê Mezin, Fafirtin, Bircika Silêman, Basûfanê, Birca Heyder, Keleha Basûtê, Eyndarê, Kurzêlê, Qîbarê, Cindirêsê, Şiyê, Nebî Horî yanê Sîros, Kela Canpolat û Kela Hawarê. Ev hemû dever xeml û dewlemendî û kevnariya vê herema Çiyayê Kurmanc e.

Yek ji bermahiyên herî balkêş û kevnare li herema Çiyayê Kurmanc, Şikefta Dûderiya ye. Di vê şikeftê de hestiyên "mirovê dema Neandertal" hatiye dîtin ku temenê vî mirovî di navbera 50 û 100 hezar sal de tê texmînkirin. Ji ber vê taybetiya xwe Şikefta Dûderya di alema arkeolojiyê de xwedî cîhekî taybet e. Li aliyê din ev şikêfta ku li nêzî gundê Birca Evdalo ye navê xwe daye eşîrekî heremê jî. Şikeft 13 kîlometre dûri Efrînê ye.

Li gor lêkolîn û destkevtên ku li heremê diyar bûne, dîroka Çiyayê Kurmanc digîje berî zayînê heta salên 3 hezaran. Salên 1200’ên berî zayînê dema İmparatoriya Hûrî-Mîttanî ye. Piştî dema desthilatiya Asûriyan, dema Med û Parsan heta salên 300’an didome. Piştî hatina İskender herem dibe yek ji navenda Helenîzmê. Heta sala 637’ên piştî zayînê Çiyayê Kurmanc di destê Makedon, Roma û Bîzansiyan de dimîne. Di dema Helenîzmê de li Efrînê berhemên giranbiha tên danîn ku rêça gelek ji van berheman hîn jî li ser piyane.




**Welatê Selehedîn Eyûbî**

Di sala 637’an de herem dikeve destê muslumanên Ereb. Artêşa erebên Musluman di bin fermandariya Ebû Ubeyd İbn Cerah de ketiye Çiyayê Kurmanc û heremê bê şer bindest xistiye. Çiyayê Kurmanc di serpêhatiya hezar salan de di nav Emewî, Eyûbî, Abbasî, Mendî û Memlûkiyan de dest guhertiye.

Çiyayê Kurmanc di dema hukumdariya Selehadînê Eyubî de jî yek ji navendên girîng yê vê dewleta kurd bûye.

Efrîn û herem tevî stratejîkbûna erdîma xwe û bi nêzikbûna kevîya Derya Spî û bajarên wek Ruha, Antakya, Şam û Helebê devereke girîng bûye. Gelek eşîrên ku ji çar aliyên Kurdistanê tevlî artêşa Selehedîn bûne di demên paş de jî li heremê manê û heta niha jî li wir in.

Li Çiyayê Kurmanc serdema Osmaniyan ji salên 1607'an destpêdike û heta sala 1918'an yanê piştî yekem Şerê Cîhanê didome. De dema desthilatiya Osmaniyan de bi dehan malbatên kurd ji cih û warên xwe hatine dûrxistin û koçî deverên din bûne. Ji van malbatan yek Canbolatê kurd in ku di serhildanên dijî Osmaniyan de hatin sirgûnkirin û hîn jî li Lubnanê cîhwar in û rêvebiriya gelê Durzî dikin.

Navenda herema Çiyayê Kurmanc bajarê Efrînê ye. Şêniya Efrînê tevî gundan nêzî 300 hezarî ye. Herem ji navçeyên Cindirisê, Mabeta, Şêra, Şiyê, Raco û Bilbilê pêk tê. Ji bilî ev 7 xopanên Efrînê 263 gund jî bi bajêr ve girêdayî ye. Efrîn di warê pergala rêvebiriyê de navçeyeke bajarê Helebê ye.

Efrîn piştî destpêka şerê navxweyî ya Sûrî, di sala 2012'an de ji aliyê kurdan ve wek kantonek tê birêvebirin û ji hingê ve jî di bin ambargo û ablûkayê de ye. Herem di 18 yê meha çileyê vir ve ji aliyê artêşa tirk û cîhadîstan ve di bin êrişê de ye.

**Bajarê zeytûnan**

Efrîn bi giştî bi girên bilind û çiyayan ve xemilandiye. Li Rojavayê Kurdistanê herema bilind tenê Çiyayê Kurmanc e. Ev çiya sîlsileya ji Rêzeçiyayên Toros e. Bilindahiyan girên heremê li seriya 1000 metreyî ne.

Firehiya xaka Efrînê 2033 kîlometreqare ye. Li Efrîne bi navên Cûmê, Meydankê û Kitêxê sê deşt hene. Li deştên Efrînê ji bilî kiştûkalê, lawirvanî jî tê kirin. Helbet dema Efrîn tê gotin zeytûn tê bîro mirov. Zeytûnên heremê navê Afrîinê bi cîhanê dane naskirin. Li heremê di navbera 13 û 18 milyon de darê zeytûnê hene. Li gor lêkolînên li ku heremê hatine kirin, hebûna darên zeytûnê li Efrînê digîje 12 hezar sal berî zayînê. Zeytûnên Efrînê bi qalîte, vîtamîn û mîneralên xwe di nav mînakên xwe de yên herî baş hatine hilbijartin. Li aliyê din ji ber kevnbûna teknîkê, awayên kenveşopî û xêrnexwaziya dewletê, Efrînê ji zêytûnê têra xwe feyde nastînin. Li Efrînê ji bilî zeytûnan bî deh hezarên darên sêv, hinar, hejîr û mişmişan jî hene. Werwiha li Efrînê çandiniya genim û ceh jî tê kirin.

Efrîn heta dema dagira frensiyan wek bajarokekî bi Kilîsê ve girêdayî bû. Piştî dagira frensiyan bi Helebê ve hat girêdan. Piştî ku sînorê navbera Tirkiye û Sûrî hat danîn, li gelê herêmê ji sûk û bazara Kilis û Qirixanê hat qedexekirin. Pêwîstî bi navendeke nû peyda bû û frensiyan bajarê Efrînê ava kirin. Di bihara 1927'an de, frensiyan gundî agahdar kirin, ku sûkeke nû ava dibe û wê sûk rojên çarşemê vekirîbe. Bi vî awayî berê bazirganiyê dan bajêr û evder wek navenda rêvebiriya heremê hilbijartin.

**Serhiladana Brahîm Henano**

Piştî destpêka yekem Şerê Cîhanê û hatina frensiyan ya Sûrî û dabeşkirina serxet û binxeta Kurdistanê, di nav kurdan de li dijî dagirkeran nerazîbûn destpêkir. frensiyan guh nedidan hasasiyetên kurdan û haya wan ji mafên kurdan nîn bû. Ji ber vê yekê kurd li dijî frensiyan ketin tevgerê.



Ji ber gelek sedeman kurdan li Sûrî berî ereban li dijî frensiyan dest avêt tifingan. Di berxwedana li dijî frensiyan de fîşeka yekem ji alî Şêx Brahîm Henano yê kurd ve di sala 1939'an de li herêma Çiyayê Kurmanc û Efrînê hat teqandin. Tevgera Şêx Brahîm wek 'murîdî' dihat binavkirin. Hêza wî ji gundî û cotkaran pêk dihat. Serhildan dirêj ajot û gelek zirar gihîşt hêzên frensî. Tolhildana frensiyan ya li dijî kurdan jî giran bû. Di encama êrişa frensiyan de gelek gundên Efrînê hatin valakirin û beşek ji gele heremê xwe avêtin Tirkiyê.

**Hêlîna Eşîran**

Efrîn di warê demoxrafya xwe ya netewî de jî devereke balkêş e. Li Efrînê ji Alewiyan heta Ezdiyan ji Dêrsimê heta Amedê gelek eşîr û malbatên kurd bicîh bûne. Eşirên kurd yên Çiyayê Kurmanc, wek diyarin evin: Amka, Şikak, Robarî, Biyan, Şêxan, Goçer, Dina, Heyştiya, Xastiya. Balkêş e ku gelek ji eşîrên Efrînê li çar aliyê Kurdistanê belavbûne.

Li Efrînê di salên dawîn de hin ereb jî bicîh bûne. Hijmara ereban nêzî 6 hezarî ye. erebên heremê bi giranî li bajarê Efrîn û Cindirêsê bicîh bûne. Malbatên Umêrat û Bobene yên ereb bi giştî zimanê kurdî diaxafin û qismek ji wan cil û bergên kurdî jî li xwe dikin.

Rejima Baas piştî salên 1963'an ku dest bi siyaseta bê kurdbûna heremê kir, erdê kurdan bi zorê ji wan stend û li ereban belavkir. Erebên Çiyayê Kurmanc jî li gundên Deşta Cûmê û li her du aliyên çemê Efrînê bicîh bûne.

Li aliyê din ji herema Çiyaye Kurmanc gelek kesên welatparêz yên navdar jî derketine. Bi taybetî dengxweşên wek Cemîl Horo, Elî Tûjo û Xelîl Xemgîn bûne remza hunermendiya Efrînê.

Herwiha ji ber ku Çiyayê Kurmanc her tim ji bo welatparêz û berxwedêrên Kurdistanê re bûye hêlîn gelek şexsiyetên navdar; yên wek Doktor Nûrî Dêrsimî, Cegerxwîn, Reşîd Hemo jî li heremê bicîh bûne.

**Peytexta Dîrokê**

Ji bilî dewlemendiya xezayî ya Çiyayê Kurmanc, herem ji alî berhemên dîrokî û bermahiyên şaristaniyan ve jî wek xezineyekî servekirî ye. Wiha diyar e ku li heremê ji sed hezar sal vir ve jiyan hebûye û ev xak tû car xalî nemaye.

Li heremê şaristaniya herî kevnare ku li pey xwe bermahî hiştiye Hûrî-Mîtanî ne.



Wek tê zanîn Dewleta Hûrî ji bo parastina li erdîma ku hukum ajotiye keleyan avakiriye. Yek ji van keleyan Kela Hûrî ye. Ev kele 45 kîlometre dûrî Efrînê ye. Kele herçend bi navê Hûriyan tê naskirin û di dema wan de hatibe avakirin jî, di dema Madoparsan û Selokîdan de nav guhertiye û hatiye tamîrkirin.


Li heremê hin bermahiyên ji dema Mado-Parsan jî mane hene. Wek mînak Kela Sîros. Sîros (Cyros) ku navdaneke Yûnaniye, navê xwe ji Mîrê Medî Korş stendiye. Herwiha hebûna çem û rûbaran yên heremê bûne sedem ku gelek pirên giranbiha jî bên avakirin ku hebûna wan heta îro jî didome.

Berhemeke ku navûdengê Efrînê gihandiye cîhana Xiristiyaniyê jî Ezîz Sîmon e. Ezîz Sîmon ku di sala 363'an de li Edenê hatiyê jiyanê û piştî dema xortaniya xwe li Efrînê bicîh bûye îro yek ji remzên Efrînê ye.

Kela Sîmon 20 kîlometre dûri bajarê Efrînê ye. Avahiya ku îro wek Kela Sîmonê tê naskirin di demên pêşîn de tenê dêrekî bûye. Ev dêr di alema İsewiyan de yek ji dêrên herî kevn û mezin e.

Di sala 970'an de di dema Bîzansiyan de ji ber balkêşiya wê li dorê dûwarên keleyekî hatiye avakirin û evder wek bajarekî mezin bûye û li heremê bûyê yek ji navenda ola Xiristiyaniyê. Bajar hingê bi navê Tîlasonîs hatiye naskirin.

Yek ji bermahiyên Hûriyan li heremê bajarê Eyndara ye. 5 kîlometre dûrî Efrînê ye û li seriya çemê Efrînê ye. Eyndara bi erebî tê wateya "Çavên Dara." Wek tê zanîn Dara yek ji mîrê Mado-Parsan bûye. Ji nav ev bajarê kevnarê çemekî biçûk û kahniyekî diherike. Bajarê kevnare 5 kîlometre dûrî Efrînê li kêleka gundê Çavdara ye.



# JI WE DIKIM ÎSTÎRHAM BIXWÎNIN HÛN BI TEMAM

DÎYADÎN AKDEMÎR

Ey gelî xwuşk û bira
Hela tev werin vira

Bi Xwedê ez ditirsim
Hinek tiştan bipirsim

Xelk dibê Kurd nezanin
Hem nezanê erzan in

Min got Kurd bi aqilin
Kê gotî Kurd cahil in

Gotin heyran nexeyîd
Gotinên xwe têk teyîd

Ji bo Xwedê netirse
Van gotinan bipirse

Bêje ey gelî Kurdan
Bikin bo min xeberdan

Ka kî ji we dizane
Ka kî ye ji we zane

Bêje navê zanyaran
Şair û nivîskaran

Bêjin zanê gelê xwe
Navê şêx û melê xwe

Bînin ziman mêrxasan
Em nasbikin wan xasan

Hela bêjin çi bûye
Kî hatiye kî çûye

Bersiv bidin bi germî
Dernexin hûn min şermî

Ewil li hevdu nêrîn
Dûre bi halek şermîn

Gotin ka em çi zanin
Bi Xwedê em nizanin

Min dî yek ji wan qîrî
Got qey tune Cizîrî

Piştî wî got yê sanî
Navê Ahmedê Xanî

Anî ziman, got heyran
Qey tune Feqyê Teyran

Dûre tevan kirin pes
Gotin xoce êdî bes

Êdî meke sewalan
Dev berde ji ehwalan

Tenê vana dizanin
Wekî din em nizanin

Ew jî zanin navê wan
Nizanin em gavê wan

Ka wekî din kes hene
Navê wan bêje qene

Min go ey xwuşk û bira
We derd çêkir ji mi ra

Bi Xwedê ez her deman
Ji ber we dikim eman

Çima bûye çi bi we
Nifir bûye qey li we

Heta hûn xwe nekin nas
Hûnê nebin qet xelas

Nezanîtî ne eyb e
Lê fêrnebûn pir eyb e

Bo ji tiştan bin haydar
Divê hûn baş bin guhdar

Bêjim bo we ez destan
Bicoşînim ez hestan

Ez ê navan bibêjim
Xemên dilan birêjim

Dibêjim ey gelê Kurd
Evan navan weka wird

Ezber bikin tev ji dil
Hem bixwînin wek bilbil

Bizan ev zat deha ne
Her yek wek ejdeha ne

Ji we dikim îstirham
Bixwînin hûn bi temam

Tahirê Hemedanî
Hem wî Ahmedê Xanî

Yek çem bû yê din kanî
Yek çiya, yê din banî

Şêx 'Elîyê Herîrî
Û Melayê Cizîrî

Aşiqbûn ji dil û can
Ew jî weka Mûradxan

Evdilsemedê Babek
Mehmed Emîn Zekî Bek

Hecî Qadirê Koyî
Û Fettahê Hezroyî

Mestûre Erdelanî
Û Selîm Silêmanî

Şerefxanê Bedlîsî
Tarîx bo me nivîsî

Ahmed Hîlmîyê Koxî
Û 'Elî Teremoxî

Mele Xelîlê Sêrtî
Nivîsandî bi mêrtî

Ji bo hemî xas û 'am
Nivîsî Nehcul Enam

Ebdurehman Mizûrî
Mela Mihemed Nûrî

Nûreddîn Birîfkanî
Ne kêmtir bû ji Xanî

Bizan Feqîyê Teyran
Em tev ji bo wî heyran

Di muzîkê de Zeryab
Dil û can dikir kebab

Feylesof Suxrewerdî
Û hiqûqnas Mawerdî

Naske Îbnî Xelîqan
Û hem Mele perîşan

Welîyê vî welatî
Şemsedînê Exlatî

Ji alî rojhilatê
Derket Melayê Batê

Li ser pêxember Mehmûd
Nivîsîye wî mewlûd

Binasin Ebu'l Fîda
Alimekî pir cuda

Erdnas e hem dîroknas
Evî zatî bikin nas

Pertew Begê Hekarî
Fehmî Begê Peçarî

Mele Ahmedê Nalbend
Nivîsiye gelek bend

Li Hekarî Sebûrî
Meşhûr e wek Şêx Nûrî

Ger bi ya min tu dikî
Nas bik 'Elî Findikî

Ji wê Helepça Soran
Derket Ebdulla Goran

Bizan seydayê Tîrêj
Tim dûr bû ew ji qirêj

Wî Sîracê Xelîlî
Helbestvanekî mîlî

Şêx Halidê Zêbarî
Axaokê Bêdarî

Navê Ehmedê Feqîr
Tu carê nekin ji bîr

Zimanzan Şerefkendî
Xalidê Neqşîbendî

Şêx Seîdê Palewî
Qiyamekî netewî

Kir ji bo me hejaran
Li nav gund û bajaran

Zanayê 'esra bîstan
Derket ew ji Kurdîstan

Navê wî Seîd Nûrsî
Nexwest meqam û kursî

Di îlmê de gelek kûr
Nivîsye Rîsalê Nûr

Şêr bû Qazî Mihemed
Mêr bû Îbrahîm Ehmed

Bizan mala Bedirxan
Yadîgar in bo Kurdan

Kirine gelek xizmet
Xizmeteke bê minet

Bikole mala Baban
Binase mala Berzan

Ji bajarê Bazidî
Û ji xelkê Êzidî

Derketine pir zana
Ne kimtirin ji Xana

Ji mala Axtepîyan
Hem ji mala septîyan

Derketine gelek kes
Bînim ziman bi mexles

Şêx Riza Telebanî
Û Hêmîn Mukrîyanî

Axtepî tev şair in
Hem şairê mahir in

Xakî, Rûhî, 'Eskerî
Hersî ji pîsyên berî

Hesbî û Kerbelayî
Zanebûnek Xwedayî

Heye bo vê malbatê
Heq dikin tim xelatê

Qelem dibê xoce bes
Çikand li min te nefes

Bi Xwedê ez nakim pes
Navan bêjim bi mexles

Navê van şêrên Kurdî
Bînim ziman bi kurtî

Nalî, Nabî, Wefaî
Nûrî, Hadî, Wedaî

Dildar, Hişyar û Seyfî
Tahir, Zahir û Keyfî

Fanî, Qanî û Sanî
Kanî, 'Ewnî, Nîhanî

Herdî, Hêdî, Kemalî
Hewrî, Mehwî, Wîsalî

Feramerz û Heyderî
Pîramerd û Cewherî

Dilbirîn û Cîgerxwîn
Hem Hezîn û Merdimîn

Reşpojan û Sîyahpoş
Qedrîcan û ew Medhoş

Mihemedê Hezanî
'Ismet û Durefşanî

'Es'ed, Xasî, Kavarî
Ehmed, Feqîr û Arî

Kurdan got xocê delal
Te em kirin kerr û lal

Ji te em dikin lavan
Dawî bînî li navan

Bi Xwedê nema taqet
Ma tu nakî îstîrhet

Min got gelî hevalan
Bise nekin sewalan

Heyran hela nemirin
Çima hûn nasebirin

Ji bo hûn bibin şiyar
Zanyaran dikim diyar

Madem kî hûn wehîdin
Û li min dixeyîdin

Bila navê dengbêjan
Û navê sitranbêjan

Bimîne tev carek din
Sipartek be ji bo min

Bise hinek kesên nêz
Tenê bi nav bikim xêz

Birêz Ebdulla Pêşew
Natirse ji kesî ew

Rewşenbîr Osman Sebrî
Rehmet kir wî li Sûrî

Li hember bênamûsa
Mertal bû Apê Mûsa

Tu bizan Şêrko Bêkes
Qendîl bû ji bo herkes

Nas bik' Bextiyar Elî
Tim û tim ew dikelî

Doktor Nûreddîn Zaza
Weka me nediraza

Baş bû Fûadê Temo
Qenc bû Erebê Şemo

Hem wî Têmûrê Xelîl
Hem jî Celîlê Celîl

Derketine ji Qefqas
Van camêran bike nas

Bizan li vê dewra dar
Zeyelabidîn Zinar

Ji bo vî gelê hejar
Sed û bîst û neh asar

Çi mezin û çi hurdî
Nivîsîn tev bi Kurdî

Ji bîr neke ey Kurdo
Navê Qenadê Kurdo

Bizan li ber vî dilî
Cuda ye cîy ' Gurdilî

Mele Yasînê Şemê
Evindar bû wek Memê

Mehmed Ûzûn û Arjen
Herdu gelekî nûjen

Min dil heye bikim pes
Ji bo navan bibêm bes

Ev çend roj e min xwu xwar
Nivîsand min bi êvar

Navê Kurdên nivîskar
Û rewşenbîr û zanyar

Min fêm kir ku gelekin
Bi nivîsê naqedin

Wan kesên min nanîn zar
Li min bibin efûkar

Zanyarên niha dijin
L'qisûrê min nenêrin

Navê we ma carek din
Bila deyn be ji bo min

Ez zanim hûn zaf pirin
Yek ji yekî çêtirin

Lê min nema qet taqet
Divê bikim îstîrhet

Sipas bo we guhdaran
Heval û alîkaran

Van gotinên Embarî
Qebûl kin bi diyarî







FERHENGOKA

# REZBERÎYÊ Û MIŞEXTÊ

KURDÎ-KURDÎ
KURDÎ-TIRKÎ

ZÎWER ÎLHAN

çandname

| FERHENGOKA ÇANDA REZBERÎ Û MIŞTAXÊ KURDÎ-KURDÎ | | |
|---|---|---|
| **Ard** | nv. | Daringa quta ku dikeve nav şîreyê da ku bibe pelûl. |
| **Ava ariyê** | nv. | Ava zeytandinê. Ava ku bi arî(xwelî) yê tê kelandin û zelilandin û piştre dîsa tê germkirin ku tirî tê de bêdakirin dibe mewîj. |
| **Bastîq** | nv. | Pelûla ku tîr bûye û li ser cawan tenik tê raxistin. |
| **Benî** | nv. | Qûtê bigûz, bi behîv û xelekî ku di pelûlê de tê dakirin. |
| **Beran** | nv. | Her rêzeke mêwên rez. |
| **Berfdimsk** | nv. | Şêraniya ku berf û dims têkilhev e. |
| **Bistîk** | nv. | Serkê gûşiyê tirî ku mirov pê radihêjê. |
| **Botav** | nv. | Giyayê ku dikeve nav dimsê û tahma wê xweş dike. |
| **Cembek** | nv. | Selika bi qasî metroyekê dirêj û fireh ku ji şivên xosan tê çêkirin û tirî dikevêyê. |
| **Cot kirin** | lkr. | Bi alava cot, serûbinkirina xakê. |
| **Çardax** | nv. | Holika ji bo ku dêlî biçe ser banê wê hatiye çêkirin. |
| **Çemçik** | nv. | Hesk. Kepçeya ku dims an şîre pê tê dagirtin an jî valakirin. |
| **Çilak** | nv. | Darikê du şaxî ku beniyê di tayan de, ji bo daliqandinê pêve tên girêdan. |
| **Çilmisî** | sft. | Tiriyê ku di gûşî de sist û nermokî bûye. |
| **Çiradang** | nv. | Dara ku şivên wê di pelûlê de tê dakirin ku bibin beniyê bêgûz. |
| **Dêlî** | nv. | Mêwa dirêj. Dara tirî ya ku diçe ser çardaxan. |
| **Dims** | nv. | Şîreya ku hatiye kelandin, tîr bûye û kewitiye. |
| **Dist** | nv. | Beroşa mezinî ku şîre tê de têkelandin. |
| **Gurnî** | nv. | Tiriyê ku libên wê di ber hev de ne. Tiriyê mikebz. |
| **Gûşî** | nv. | Koma libên tirî ku peve girêdayî ne. |
| **Helîl** | nv. | Qûtê qewîn û hişk ku ji pelûla şîreyê tê çêkirin. |
| **Hersim** | nv. | Tiriyê ku hê negihaye û tirş e. |
| **Hesirandin** | lkr. | Perçiqandin û pêlêkirina tirî ku ava tirî pê derdikeve. |
| **Hesk** | nv. | Çemçik. Kepçeya ku dims an şîre pê tê dagirtin an jî valakirin. |
| **Hewdel** | nv. | Pelûl. Şîreya ku ard ketiye navlê. |

| | | |
|---|---|---|
| **Katik** | nv. | Topa bastîqê. |
| **Kefçeng** | nv. | Alava bêqul û mezin ku pê kefa ser şîreyê tê stendin. |
| **Kefgîr** | nv. | Alava biqul û biçûk ku pê kefa ser şîreyê tê stendin. |
| **Kelem** | nv. | Nîvşaxa mêwê ku hatiye kesixandin. |
| **Kesixandin** | lkr. | Bi hosteyî û zaneyî jêkirina şivên mêwan da ku qelema bidênê û pir tirî lê bikeve. |
| **Keşmûl** | nv. | Tilmisk. Piştî hesirandina tirî, çopa ku ji ber dimîne. |
| **Kewitî** | nv. | Şîreya ku gihaştiye tahma kemilî û hatiye ber kelê. |
| **Kewtik** | nv. | Gemar û bêmirêsiya tevlî kef ku bi ser şîreya kelandî dikeve. |
| **Kevrez** | nv. | Rezê ku pir kevir tê de hene. |
| **Kozex** | nv. | Malikên nav rezan ku ser wan û derdora wan tevde bi keviran hatine avakirin. |
| **Lib** | nv. | Her taneya gûşiyê tirî. |
| **Mehsere** | nv. | Navgîn an jî hewdikê ku tirî tê de tê hesirandin. |
| **Meliqî** | sft. | Tiriyê ku mezin bûye; lê nerm e. |
| **Mencûlk** | nv. | Libên tirî yên ku di gûşî de hişk bûne. |
| **Mer dan** | nv. | Bi merê serûbinkirina xaka derdora mêwê. |
| **Merkeb** | nv. | Selika mezin ku ji şivên xosan tê çêkirin û tirî dikevêyê. |
| **Mêw** | nv. | Dara tirî ya nêzîkî erdê. |
| **Mewîj** | nv. | Tiriyê ku di nav ava xweliyê de hatiye dakirin û li ber rojê hatiye hişkkirin. |
| **Mewîjê kerkûş** | nv. | Mewîjên ku ji tiriyê kerkûş tê çêkirin û rengê wê qehweya vekirî ye. |
| **Mewîjê qurfok** | nv. | Mewîjê ku ji tiriyê qurfok tê çêkirin. Zer e. |
| **Mewîjê zeytî** | nv. | Mewîjê ku ji tiriyê zeytî tê çêkirin. Dirêjî zer e. |
| **Mezrîb** | nv. | Boriya mahserê. |
| **Mezrone** | nv. | Tiriyê zer û sorikî ku şîre jê tê çêkirin. |
| **Mikebz** | nv. | Tiriyê ku libên wê di ber hev de ne. Tiriyê gurnî. |
| **Miştaxe** | nv. | Hilberiya tirî û karûbarên ku ji qûtên wê têne çêkirin. |
| **Mot** | nv. | Dims. |

| | | |
|---|---|---|
| **Movik** | nv. | Di şivên mêwan de cihê piçikî werimî ku pel ji wir zîl didin. |
| **Nikar** | nv. | Kevirên spî yên kirêcê ku dikevin nav şîreyê û pêre dikelin. |
| **Pelûl** | nv. | Hewdel. Şêraniya ku bi şîreya kelandî ard hatiye çêkirin. |
| **Pirik** | nv. | Gemar û bêmirêsiya ku piştî kelandinê di bine distê de dimîne. |
| **Qelem** | nv. | Darikê mêwê ku ji bo çandiniyê hatiye jêkirin. |
| **Qatûf** | nv. | Selika dirojokî ku ji şivên xosan tê çêkirin û tirî dikevêyê. |
| **Qawît** | nv. | Şêraniyeke ku dims û ard dikeve nav hev û girover e. |
| **Qelîka tirî** | nv. | Tiriyê ku ji bo rojên sermayê hatiye hiştin. Ev tirî, li ser gîya tê danîn, serê jî bi çilo û çadirekê tê nixumandin. |
| **Quraftin** | nv. | Jêkirina tirî. |
| **Raxistin** | nv. | Pahnkirin û tenikkirina pelûlê ya li ser cawê. |
| **Rez** | nv. | Erdê ku tirî lê çêdibe. |
| **Rezberî** | nv. | Kar û xebata nav rez û berên ku ji rez tê. |
| **Sîsika tirî** | nv. | Dendika di nava liba tirî de. |
| **Şîre** | nv. | Ava tirî ku hatiye hesirandin. |
| **Şivist** | nv. | Darikên mêwê yê ku hatine jêkirin. |
| **Tê dakirin** | nv. | Xistin û derxistina beniyan ya nav pelûlê. |
| **Tilmisk** | nv. | Keşmûl. Piştî hesirandina tirî, çopa ku ji ber dimîne. |
| **Tirî** | nv. | Mêweya şêrîn ku libên wê bi gûşî ve ne. |
| **Xelek** | nv. | Beniya bêgûz an bêbehîv ku tenê ji darikekî xelekî pêk tê. |
| **Xerz** | nv. | Rezê ku hê negihaye tirî bide. |
| **Xwirşîl** | nv. | Giyayê ku dikeve nav dimsê û tahma wê xweş dike. |
| **Veçandin** | lkr. | Tê dakirin. Ji bo çêkirina mewîjan, tê dakirina tirî ya nav ava bi xwelî û kilsê ku dikele, tê zelilandin û dûvra dîsa hatiye germkirin. |
| **Weriqîn** | lkr. | Weşîn û firkbûna libên gûşiyê tirî. |
| **Zahir ketin** | lkr. | Bûyina kulîlk û pirtikên gûşiyê tirî ku dibine hersim. |
| **Zembîl** | nv. | Selika biçûk ku ji şivên xosan tê çêkirin û tirî dikevêyê. |
| **Zinc** | nv. | Holika nav rezan ku ser wê bi şivistan hatiye girtin. |

| FERHENGOKA ÇANDA REZBERÎ Û MIŞTAXÊ KURDÎ-TIRKÎ | | |
|---|---|---|
| **Ard** | is. | Un. |
| **Ava ariyê** | is. | Kül suyu. İçine kül konarak kaynatılan su. Üzümler bu suya bandırılarak kuru üzüm haline getirilir. |
| **Bastîq** | is. | Pestil. |
| **Benî** | is. | Köme. Cevizli ya da bademli sucuk. |
| **Beran** | is. | Bağdaki her bir asma dizisi. |
| **Berfdimsk** | is. | Karlamaç. |
| **Bistîk** | is. | Salkımın elle tutulan üst bölümü. |
| **Botav** | is. | Pekmez yapımında kullanılan hoş kokulu bir bitki. |
| **Cembek** | is. | Bir metre uzunluğunda ve genişçe yapılmış üzüm sepeti. |
| **Cot kirin** | f. | Sürmek. Toprağın sürülmesi. |
| **Çardax** | is. | Çardak. |
| **Çemçik** | is. | Kepçe. |
| **Çilak** | is. | Üzüm suyuna bandırılmak için hazırlanmış ipe dizili ceviz veya bademlerin ucuna takılan çatallı çubuk. |
| **Çilmisî** | sft. | Pörsümüş. Gevşeyip sarkmış üzüm. |
| **Çiradang** | is. | Bulamaca bandırılan bir çeşit ağaç çubuğu. |
| **Dêlî** | is. | Çardaklara tırmanan asma ağacı. |
| **Dims** | is. | Pekmez. |
| **Dist** | is. | İçinde şıranın kaynatıldığı kazan. |
| **Gûşî** | is. | Salkım. |
| **Helîl** | is. | Pekmezden yapılan pestilden daha yoğun ve daha kalın olan yiyecek. |
| **Hersim** | is. | Koruk. Henüz olgunlaşmamış ekşi üzüm. |
| **Hesirandin** | lkr. | Üzümü sıkma ve suyunu çıkarma işlemi. |
| **Hesk** | is. | Kepçe. |
| **Hewdel** | is. | Üzüm suyu ile un karışımı bulamaç. |
| **Katik** | is. | Üçgen şeklinde pestil topu. |

| | | |
|---|---|---|
| **Kefçeng** | is. | Deliksiz büyük kefgir. |
| **Kefgîr** | is. | Küçük delikli kefgir. |
| **Kelem** | is. | Budak. Ağacın gelişerek dal olacak sürgünü. |
| **Kesixandin** | f. | Budamak. |
| **Keşmûl** | is. | Üzümün sıkılmasının ardından arta kalan çöp. |
| **Kewitî** | is. | Kıvamına ulaşmış ve kaynamaya yaklaşmış pekmez. |
| **Kewtik** | is. | Kaynayan üzüm suyunun üstüne çıkan atık. |
| **Kevrez** | is. | İçinde çok taş bulunan bağ. |
| **Kozex** | is. | Taştan yapılmış bağevi. |
| **Lib** | is. | Üzüm tanesi. |
| **Mehsere** | is. | Cendere. İçinde üzümün sıkıldığı, preslendiği araç veya küçük havuz. |
| **Meliqî** | sft. | Büyümüş ama yumuşak olan üzüm. |
| **Mencûlk** | is. | Üzüm salkımında kurumuş üzüm tanesi. |
| **Mer dan** | is. | Bellemek. Toprağın belle havalandırılması. |
| **Merkeb** | is. | Büyük üzüm sepeti. |
| **Mêw** | is. | Asma ağacı. |
| **Mewîj** | is. | Kuru üzüm. |
| **Mewîjê kerkûş** | is. | Açık kahve renginde kuru üzüm çeşidi. |
| **Mewîjê qurfok** | is. | Sarı renkte kuru üzüm çeşidi. |
| **Mewîjê zeytî** | is. | Uzunumsu ve sarı renkte kuru üzüm çeşidi. |
| **Mezrîb** | is. | Cendere düzeneğinin borusu. |
| **Mezrone** | is. | Sarı ve kırmızımsı renkte şıra yapılan üzüm çeşidi. |
| **Mikebz** | is. | Taneleri sık ve bibirine yapışık üzüm salkımı. |
| **Miştaxe** | is. | Bağbozumu. |
| **Mot** | is. | Pekmez. |
| **Movik** | is. | Asma ağacının tomurcuk veren gözesi. |
| **Nikar** | is. | Kaynayan üzüm suyuna konan kirecin yapımında kullanılan beyaz ve yumuşak taşlar. |

| | | |
|---|---|---|
| **Pelûl** | is. | Bulamaç. Üzüm suyunun önce kaynatılıp sonra içine un katılması sonucu yapılan tatlı yiyecek. |
| **Pirik** | is. | Üzüm suyunun kaynamasından sonra kazanda altta biriken çer çöp. |
| **Qatûf** | is. | Uzunca yapılan üzüm sepeti. |
| **Qawît** | is. | Pekmez ve un karıştırılarak yapılan top şeklinde küçük bir tatlı. |
| **Qelem** | is. | Dikilmek için kesilmiş asma çubuğu. |
| **Qelîka tirî** | is. | Soğuk havalar için bırakılmış ve saklanmış, üzüm. Bu üzüm, otların üstüne serilir, üstü de meşe palamudunun yapraklı çalı çırpısı ve çadırla örtülür. |
| **Quraftin** | f. | Üzüm kesmek. |
| **Raxistin** | f. | Pestil bulamacının kumaş üstüne ince bir şekilde serilmesi. |
| **Rez** | is. | Bağ. |
| **Rezberî** | is. | Bağcılık. |
| **Sîsika tirî** | is. | Üzüm çekirdeği. |
| **Şîre** | is. | Üzüm suyu. |
| **Şivist** | is. | Kesilmiş asma ağacı dalı. |
| **Tê dakirin** | is. | Sucukları bulamaca bandırmak. |
| **Tirî** | is. | Üzüm. |
| **Xelek** | is. | Çember şeklinde hazırlanmış ve bulamaca bandırılan cevizsiz ve bademsiz sucuk. |
| **Xerz** | nv. | Henüz üzüm verecek olgunluğa erişmemiş bağ.. |
| **Xwirşîl** | is. | Pekmez yapımında kullanılan hoş kokulu bir bitki. |
| **Veçandin** | is. | Bandırmak. Kuru üzüm yapımı için, üzümün kül ve kireç karışımından oluşan kaynatılmış ve durulanmış ardından tekrar ısıtılmış suya bandırma işi. |
| **Weriqîn** | is. | Üzüm salkımı tanelerinin dökülmesi ve seyrekleşmesi. |
| **Zembîl** | is. | Küçük üzüm sepeti. |
| **Zahir ketin** | f. | Üzüm salkımlarındaki çiçek ve tüylenmenin koruk halîne gelmesi. |
| **Zinc** | is. | Üstü kesilmiş asma dallarıyla kaplı bağ çardağı. |

## ÇAVKANÎYA FERHENGÊ

1) Komisyon (Fevzi Karademir, Zîwer Îlhan, Ahmet Korkut, Nezir Gümüş), (2014) Ferhenga Kurdî-Tirkî, Türkçe-Kürtçe, TDK, Ankara

2) FARQÎNÎ, Zana (2011). Ferhenga Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Çapa Pêncemîn, Stenbol.

3) EKİCİ, ABDULLAH (2015). Ferheng Soranî-Kurmancî-Tirkî,Sîtav, Enqerê.

4) BOTÎ, Kamêran Silêman (2006). Ferhenga Kamêran, Kurdî-Kurdî, Spîrêz, Duhok.

5) D. Îzolî (2011). Ferhenga Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî, Weşanên Deng, Çapa Şeşemîn, Diyarbekir.

6) Torî (1999). Ferhenga Kurdî- Tirkî, Türkçe- Kürtçe, Berfîn Yayınları, İstanbul.

7) Farîzov (1994). Ferhenga Tirkî-Kurdî (Çeviri ve Uyarlama: Mehmet Demir), Özge Yayınları, Ankara.

8) AYDOGAN, Mustafa (2012). Rêbera Rastnivîsînê, Rûpel Yayınları, İstanbul.

9) TAN, Sami (2011). Rêzimana Kurmancî, Çapa Berfirehkirî, İstanbul Kürt Enstitüsü Yayınları, İstanbul.

10) YILDIRIM, Kadri (2012). Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanci Lehçesi), Berdan Matbaacılık, İstanbul.

11) http://ferheng.org

# PIŞTÎ VEGIRTINA KORONAVÎRUSÊ REWŞA TENDURISTÎYA LAŞ

FZT. MUSTAFA ÖNAL - FÎZYOTERAPÎ Û REHABÎLÎTASYON

**MUSTAFA ÖNAL**

Ji navçeya Mêrdînê Dêrika Çiyayê Mazî ye. Di navbera salên 2005-2009î da li Zanîngeha Stenbolê beşa Fîzyoterapî û Rehabîlîtasyonê xwendîye. Li Stenbol û navçeya Mêrdînê Şemrexê li sazîyên taybet ên astengdaran wekî fîzyoterapîst xwebitîyê. Di sala 2015an da li Nexweşxaneya Dewletê ya Mêrdînê dest bi kar dike û niha jî li wir dixebite.

Koronavîrus an jî covîd-19, di sala 2019an û vir da bandorê li ser mirovan dike.

Mirovên vê vîrusê vedigirin dikevin rewşeke çawa?

Piştî nexweşîyê mirov ji alîyê laşî (bedenî, fizîkî) ve bi kîjan pirsgirêkan re rû bi rû dimînin?

Mirov dikarin çawa xwe ji bandorên giran ên koronayê biparêzin?

Em ê li ser bersivên van pirsan rawestin lê berî ku em derbasbin mijara xwe divê em di derbarê koronavîrusê da çend agahîyan hîn bibin ku em bizanibin em ê çawa bergirîyan bigirin.

Koronavîrus, li gor zanyarîyên heyî, cara yekem di sala 2019an da li eyaleta Wuhanê ya welatê Çînê derketîye û li tevahîya cîhanê belav bûye. Ji ber ku êşeke berbelav e wekî pandemîya covîd-19 hatîye bi nav kirin. Pandemî, ji êş û nexweşîyên berbelav ên ku li gelek deran derdikevin re tê gotin.

Xebatên ji bo dîtina derzîyê (parzayê) û dermanan gihîştine qonaxeke mezin û mirovahî ji van xebatan êdî bi hêvî ne. Ji bo parastina ji koronavîrusê divê




mirov çend tiştan bi baldarî pêk bînin: “Dûrahî, rûdank(rûpoş), paqijî”. Divê di navbera mirovan da herî kêm 1,5-2 m. hebe. Herwiha bikaranîna rûdankê jî pir girîng e. Divê mirov destên xwe nedin poz, dev, çav û rûyên xwe û destên xwe herî kêm 20 çirkeyan bi av û sabûnê bişon.

Em werin ser mijara xwe. Kesên koronavîrusê vedigirin li nexweşxaneyan bên razandin jî, li malê di bin çavdêrîyê da bin jî; ji ber bandorên koronavîrusê bêtevger dimînin. Herwiha kesên di karantînayê da yan jî ji ber qedexeyan nikaribin derkevin derve jî li malê an radizên, an li fîlman dinêrin an jî dema xwe bi telefon, kompîtur, xwendin, xwarin û vexwarinê derbas dikin. Di van hemû qonaxan da heke mirov ji cîyên xwe nelivin, egzersîzan nekin, li malê nemeşin û hwd. piştî demekê wê gelek nexweşî û pirsgirêk derkevin.

Qelewî (obezîte), êşa masûlke û hestîyan, werm, pirsgirêkên wekî piştxwarî (skolyoz) û piştxûzî (kîfoz), êşa movikan hinek ji van pirsgirêkan in.

Bingeha pirsgirêkên laşî, bêtevgerî û tevgerên çewt in. Tevger, ji bo berdewamîya jîyanê çalakîyên girîng in. Çi ne ev çalakî?: “Tevlivîn, zivirîn, lerizîn (cirifîn, ricifîn), meş, bazdan, avjenî...”

Tevger, bi gelemperî, bi hevkarîya masûlke û hestîyan pêk tê. Bi tevgerê re xwîn, gera xwe ya laşî didomîne. Ev jî tê wateya berdewamîya jîyanê.

Di laşê mirovên gihîştî da kêmzêde 206 hestî û 300 cot masûlke hene. Bêtevgerî, herî zêde dibe sedema nexweşî û pirsgirêkên masûlke û hestîyan. Bi taybetî jî xetereya li ser hestîyê piştê pir zêde ye: “Fitq, êş, qerimîna masûlkeyan, asêbûn û eciqîna rehikan û hwd.”

Bêtevgerî, dibe sedema gelek pirsgirêkan. Herwiha gelek pirsgirêkên heyî jî ji ber bêtevgerîyê giran dibin. Em dikarin hinek pirsgirêkan wisa rêz bikin:


**Artrît (Arthritis)**

Kulbûna movikan, movikkulî.



Tevger bi hevkarîya masûlke û hestîyan ji movikan pêk tê. Bêtevgerî dibe sedema êş û kulbûna movikan.

### Qelewîya Zêde – Obezîte




Dema mirov bêtevger bimînin, zêde zêde xwarinê bixwin hêdî hêdî di laşên wan da rûn berhev dibe û qelew dibin. Dema ev qelewî bigihêje qonaxeke xeternak wekî obezîte tê bi nav kirin.

### Osteoporoz



Osteoporoz, ji bo helîna hestîyan tê bi kar anîn. Di vê nexweşîyê da girseya hestîyan kêm dibe. Şikestina hestîyan pir hêsan dibe. Divê ev nexweşî timî di bin çavdêrîyê da be. Derman û fîzyoterapî bi hev re bên bi kar anîn bandorên osteoporozê kêm dibin. Masûlke û hestîyên mirovên bêtevger, piştî demekê lawaz dibin û şikestina hestîyan pir hêsan dibe. Bi tevgerê re girseya hestîyan zêde dibe û hestî xurt dibin.

### Osteoartrît




Gel, ji vê nexweşîyê re dibêjin “kirêcgirtin”. Bi taybetî jî li çongê/çokê xuya dibe. Osteoartrît, bi hilweşandina kerînekê (cartilage) re kulbûna movik û hestîyan e. Di navbera hestîyan da kalsîyûm kom dibe, ji ber vê sedemê wekî (kirêcgirtinê/kilsgirtinê) jî tê bi nav kirin (kalsîfîkasyon). Rêbazên ji bo başkirina bandorên osteoartrîtê ev in: Bergirîyên parastinê, derman, fîzyoterapî rehabîlîtasyon. Bi tevger û egzersîzan re bandora vê nexweşîyê kêm dibe.

### Romatoîd Artrît



Romatoîd artrît, nexweşîyeke bi kulbûnê dest pê dike. Ev nexweşî domdar e û sedemên wê nayên zanîn. Herî zêde bandorê li movikan dike lê di hinav û gelek lebatên mirov da jî dibe sedema kulbûnê.



Romatoîd artrît, herî zêde bandorê li movikan dike. Movikên tilîyên dest û nigan/lingan, enîşk, mil, çong/çok û hwd. Bi gelemperî bandora li ser movikan dualî ye. Movika alîyê çepê kul bûbe, bi giştî ya alîyê rastê jî kul dibe. Movikên bêtevger, zû kul dibin û rê li ber gelek nexweşîyan vedikin.

Piştxwarî (skolyoz), piştxûzî (kîfoz), fitq, felc, hîpertansîyon, xetimîna rehên xwînê, qelewbûn û gelek pirsgirêkên din rasterast bi tevgerê re têkildar in.

**Mirov wê çawa laşê xwe ji xetereyan biparêzin?**

Laşê mirov, bi hemû lebat û pergalên xwe bêhempa ye. Mejî ferman dide; dil diavêje, çav dibîne, guh dibihîze, çerm hest dike, rehik (rîşe) hişyarîyê didin masûlkeyan û tevger pêk tê û hwd. Ji bo ev ahengî û lihevkirin hilneweşe pêdivî bi laşekî tendurist heye. Çi di dema xebatê çi di dema razanê çi di dema bêhnvedanê da divê mirov bala xwe bidin tenduristîya laşên xwe.

Me di serî da gotibû hinek kes ji ber koronayê li nexweşxaneyan tên razandin. Ev nexweşana piştî koronayê derbas dikin an wan derbasî servîsên din dikin an jî wan dişînin malê. Di serdema nexweşîyê da ev nexweş bêtevger mane. Gelek ji wan di danûstandina hilmê da pirsgirêkan dijîn. Hinek ji ber bêtevgerîyê bi êş û nexweşîyên hestî, masûlke, movikan re rû bi rû dimînin. Lawaz dibin. Li hemberî nexweşîyan qels dibin.


Bi kurtasî divê piştî koronayê ev nexweş bên parastin û ji bo jiholêrakirina bandorên bêtevgerîyê bernameyeke têr û tije bê sepandin. Bijîşk, fîzyoterapîst, derûnnas, terapîst, malbat divê bi awayekî


hevbeş li ser pirsgirêkan rawestin.

Gelek mirov jî bandorên koronayê najîn lê di karantînayê da dimînin. Gelek mirovên tendurist jî ji ber qedexeyan an jî ji bo parastina xwe ji malê dernakevin.

**Mirov çawa dikarin li malê, xwe jî encamên bêtevgerîyê û tevgerên çewt biparêzin?**

**Bikaranîna Telefonê**







Di her kêlîya jîyana me da telefon êdî bûye pêdivîyek. Di bikaranîna telefonê da piranîya mirovan ser û stûyên xwe bi ber telefonê ve xwar dikin. Bi vî awayî giranîya li ser stû zêde dibe û rewşa laşî dikeve xetereyê.

Divê mirov xwe bi ber telefonê ve xwar neke. Ya rast divê çav li hember bînêrin û em telefonê bînin rasta çavên xwe.

**Razan – Veketin – Raketin**




Balîfa rast, razana xweş. Divê em li gor vê rastîyê tevbigerin. Ji bo razaneke xweş û bêhnvedanê divê nivîn û balîfa mirov jî bi baldarî bên hilbijartin. Bêguman her mirov taybet e û hilbijartin jî divê li gor vê taybetîyê be lê divê balîf û nivîn ne zêde bilind bin ne jî nizm bin û ne zêde nerm bin ne jî hişk bin. Dema mirov serê xwe datînin ser balîfê pêwîst e stû bi ber jor û jêr ve xwar nebe û hestîyê piştê bê parastin.


**Rakirina Giranîyê**




Giranîya zêde bandorên giran li ser tenduristîyê dihêle. Divê giranî bi baldarî û bi zanebûn bê hilgirtin û

herwiha giranî divê li gor hêza mirov be.

**Rûniştin**





Rûniştin, di jîyana mirov da çalakîyeke berbelav e. Çi di dema xebatê çi di dema bêhnvedanê da em gelek caran rûdinên. Ji bo ku ev rûniştin di şûna bêhna me bîne ber me, mala me xera neke berî her tiştî pêdivî bi rûniştekên tehdeyê li dûvik, qorik u piştê nekin heye. Divê em di dema rûniştinê da pişta xwe rast bikin, nigên (lingên) xwe bidin erdê.

Koronavîrus bandora herî mezin li pişikê (kezeb) dike. Bêhna mirovan teng dike. Mirov nikarin bi hêsanî hilmê bidin û bistînin. Bi kurtasî astengîya herî mezin danûstandina hilmê ye.

Pirsgirêkên hilmê piştî koronayê jî didomin. Ji ber vê fîzyoterapî û rehabîîtasyon pir girîng e. Divê bernameyên ji çalakî û egzersîzên hilmê pêk tê ji alîyê fîzyoterapîstan ve ji bo nexweşan bên amade kirin. Bi rêya rehabîlîtasyonê piştî koronayê encamên giran dadikevin asta herî jêr.

Egzersîz, rêbazeke taybet e. Divê ji alîyê fîzyoterapîstan ve bên amade kirin û sepandin. Piştî nirxandina rewşa nexweşan, li gor pêdivîyên nexweşan bernameya egzersîzan tê amade kirin.

Li gor înternet û çavkanîyên biguman tevnegerin. Ji pisporan alîkarîyê bixwazin.



# Koma Kovargerên Kurd


Koma Kovargerên Kurd bi hêvîya kovargerên kurd bînê ba hev, bingeheke sazîtiyê bide kovargeriya kurdî, kovargeriya kurdî hem bi sewirandinê hem bi naverokê bi pêş de bibe û pirsgirêkên kovarên kurdî bi hev re çareser bike hatiye damezirandin.


## Kovarên Endam



































/KovargerenKurd
KovargerenKurd@gmail.com

# ÇANDNAME

Endama Koma Kovargerên Kurd e